

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 98
Çiriya Paşin
1989
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armananc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 98
November
1989
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Konferansa Navnetewî ya Parîsê:

Divê Heyeta Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li ser mesela Kurd civîneke taybetî çêbike

Di konferansê de ji 26 welatan parlamenter, alim, siyasetvan, Kurdolog, rojnamevan û nivîskar beşdar bûn

■ M. S. Lazarev: "Sevr hêvî bû, Lozan iflas, li Parîsê hêvî nuh dibe"

■ Peter Galbraith: "Piştî bikaranîna çekên kimyayî kesên ku sax mabûn ji alî eskerên Iraqê ve hatin gulebarankirin û cesedên wan jî bi bûldozeran hatin pelçiqandin"

■ İbrahim Aksoy: "Pirsa Kurdan ne dawa îhlalkirina mafê mirovî ye, ev doza, doza xelkekî 25 milyonî ye ku hebûna wan jî di bin tehdîtê de ye"

■ Thomas Hammarberg: "Rêxistinên Kurd rast yan jî çewt bi daxwazên azamî li mesela xwe nihêrin, bi carekê de serxwebûn xwestin ku ew jî hin dewlet û welatan ditirsîne"




Konferansa Parîsê daxwaz kir ku nunerên gelê Kurd jî bo Parlamentoya Ewrûpayê, Konseya Ewrûpayê û ji hemû civînen navnetewî yê mezî bîn vexwendin (Foto: Berbang)

▲ Nûçeya Konferansê û Birayên
Dawî yê Konferansê r. 9
▲ Pirsên bê bersiv r. 3

Di Meclîsa Nuneran a DYA de konferansek li ser Kurdan

"Gelê di Talûkê de: Kurd!"



D. Mitterand piştî Konferansa Parîsê li ser pirsra Kurdan di Meclîsa Nuneran a DYA de axaft.

Danielle Mitterand: "Di têkilbûyîna karê welatekî û laqayit mayîna li hember xelkekî de ku zulm lê tê kirinê hudûdekî gelek zirav heye. Ma emê parastina mafên esasî yê van mirovan jî welatên ku heta nuha li wan zulmê dikin re bihêlin?"

Edward Kennedy: "Êdî wê nema civaka navnetewî û dinya medenî bêdeng bimîne li hember tiştên ku gelê Kurd ê mezlûm dikşîne"

Roja 24'ê Çiriya Pêşîn bi navê "Gelê di Talûkê de: Kurd" li Grûba Mafên Mirovî ya Meclîsa Nuneran a Dewletên Yekbûyî yê Amerîka (DYA) konferansek çêbû. Konferans jî alî Grûba Mafên Mirovî ve di bîna Meclîsa Nuneran di "Ray Burn Hausê" de hate çêkirin. Di konferansê de xanima serokê dewleta Fransa; Daniel Mitterand, Sanator Edward Kennedy, endamên Kongra Amerîkî Thom Lantos, John

Dûmahîk r. 11

Swêd

Hefta Kurdistanê bi serfirazî derbas bû

Bi munasebeta 10 saliya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di 27, 28 û 29'ê Çiriya Pêşîn de li Stockholmê li Muzeya Etnografî bi navê hefta Kurdistanê çend aktivîte çêbûn. Resamên Kurd bi rismên xwe yê cur be cur ku li ser civat, jiyana û têkoşîna gelê Kurd çêkiribûn beşdarî pêşangehê bûn û weşanxanên Kurd jî bi pirtûkên xwe di pêşangehê de hazir bûn.

Di her sê rojên hefta Kurdistanê de bi video li ser rewşa xelkê Kurdistanê û bi taybetî jî li ser rewşa kampên multeciyên Kurd yê li Tirkiyê û îranê film hatin nîşandan.

Roja duyem panelek bi seroktiya Lars G. Erikson bi serokên berê yê Federasyonê; Salih İnce, Mahmûd Kiper, Zinarê Xamo, Henefî Celeplî û Keya İzol re çêbû. Serokên kevn li ser pirs û pirsgerên Kurdên Swêdê û li ser damezrandina Federasyonê axaftin û dîtînen xwe gotin.

Olof Tandberg (serokê Komîta piştigirîya Kurdan ku di sala 1966'an de li Swêdê hatibû avakirin) li ser Dr. A. Qasimlo; şehîdê Kurdistanê yê mezî û jiyana wî axaft.

Koma Dîlan bi govendên ji hin herêmên Kurdistanê reng da çalakiyên Federasyonê.

Bi seroktiya Thomas Hammarberg li ser mafên insanî yê Kurdan digel berpirsiyarên partiyên Swêdî yê ku di parlamentoya Swêd de grûba wan heye; Hans Göran Frank (Sosyaldemokrat), Maria Leissner (Folk Parti), Karin Söder (Partiya Center), Inger Koch (Partiya Moderat), Berith Eriksson (Komunîstên Partiya Çep) û Ragn Pohanka (Partiya Hawirdor) panelek çêbû. Berpirsiyarên partiyên Swêdî bi temamî li ser rewşa kampên multeciyên Kurd sekinîn. Berpirsiyara Komunîstên Partiya Çep Berith Eriksson got ku; eger 7 dewletên dewlemend ên dinê her yek 1000 multeciyî qebûl bike wê mesela multeciya hel bibe.

Dûmahîk r. 11

Rojava Mehê

10 saliya Armancê 10 saliya Armancê 10 saliya

Ders û hêviyên ji Konferansa Parîsê

Konferansa Nanetewî ya Parîsê ku di 14-15'ê Çiriya Pêşin de bi navê "Kurd: Mafên Însanî û Huviyeta Kulturî" hat li dar xistin, mirov dikare bêje ku heta dereceyekê bi awakî fireh bala raya giştî ya cihanî û ya Kurd kişand ser xwe. Helbet dengê Konferansê zêdetirîn di nav Kurdan de û li nik wan dewletên ku Kurdistan xistine bin destê xwe olan da. Ev ji tiştêki tabî ye. Berî herkesî, konferans bi naverok û encama xwe, xwe pêşberî wan dike.

Dewletên dagirker ên Kurdistanê û bi taybetî jî Iraqê û Tirkîyê gelek hewl dan ku ev konferans pêk neyê, gava di vê yekê de biserneketin, her keftelefta wan ew bû ku heta mumkun be konferans qels derbas bibe, tu encamên ciddî û berbiçav ji konferansê dernekevin. Helbet bi saya durûtiya siyaseta Fransa hinekî bi ser ji ketin. Ew hêviya ku amadekarên konferansê li ser berfirehî û sewiyebilindiya wê dikirin, bi cih nehat. Gelek vexwendiyên bi nav û deng bi bahanên cihê beşdar nebûn. Tevî vê jî wek gavek pêşî ji bo civîn û karûbarên navnetewî, Konferans xwedî beşdarîyek berfireh bû, ji Amerika ta Yekîtiya Sovyetan ji Îskandinavya ta welatên Erebi ji 26 welatan kesên navdar beşdarî konferansê bûn.

Ji alî din zêfîya biryarên Konferansê di warê siyasî de jî mirov dikare serkeftinek ta dereceyekê ji dewletên dagirkerên Kurdistanê re hesab bike. Çimkî heta dawiyê jî amadekarên konferansê hewildan ku tu biryar raste rast li dijî wan dewletan dernekevin û heta awirên tûj ên wan nekşînin ser xwe. Loma jî biryar him ji tespîta rastiya rewşa miletê Kurd û him jî ji daxwazên wan gelek dûr bûn. Konferansê ew cesaret di xwe de nedît -yan jî rê li ber hat girtin- ku hebûna Kurdan wek miletêkî bindest û perçebûyî û xwedan mafê çarenivîsa xwe bibîne. Lê li alî din ew biryarên ku li ser karûbarên pêşerojê, pêkhatina komîte û komîsyonên Kurdî û navnetewî û li darxistina Konferansên navnetewî li ser mesela gelê Kurd hatin girtin, bi giştî gavîni hêja ne, qezencek e ji bo gelê Kurd.

Di nav Kurdan de û di nav Tirkan de jî hin kes hene ku, bi her awayî perdek reş radixin ser konferansê. Helbet hin ji wan bi niyetên neçak û hin jî bi nezani berê dijayetîya xwe didin konferansê. Tirk -gelek mixabin- ku hin xwedêgravî sosyalîst jî di nav wan de îdîa dikin ku bi vê konferansê Kurdan xwe xist nav lepên Roavayîyan, ew mandateriyekê ji Fransa û Amerika dixwazin. Ev ew kes in ku Tevgera "Solidarnoş" a Polonyayê, ya Mucahidînên Afganistanê û ya Filistinê di serokatiya siyaseta Yaser Arafat de bi pesna derdixin ezmana. Tu carî nayê bîra wan ku ji wan tevgeran re bêjin xwe testîmî Rojava, Amerika yan filan dewleta emperyalîst kirine, lê ji bo konferansek wiha piçûk a navnetewî jî dikarin berê xwe bidin Kurdan û fîtra li wan bikin. Helbet em hay ji kuî û derdê wan hene. Çirok ne nû ye. Tîrsa wan jî wê yekê ye ku cara pêşî ye mesela Kurd ne di bin çengê wan de, ne wek hêzek ihtiyat (yedeke) a wan lê bi serê xwe derdiekve qada navnetewî. Ketine wê hissê ku mesele wek masiyekî ji nav lepê wan dişemite dertê.

Helbet tu kes nikare bêje ku kêmasî û şaşiyên Konferansê tunebûn. Hebûn û gelek pirr bûn. Lê gava em li van hûr dibin, berî her tiştî divê em zanibin ku, Konferans ne ya Kurdan bû ku em bêjin Rojavayîyan hatin xwe li ser civînek Kurdan ferz kirin. Konferans, civînek navnetewî bû ku di esasê xwe de amadekarê wê bi xwe jî biyanî bû. Ji Amerika, ji welatên Ewropa, ji Sovyet ji welatên Erebi, cihê cihê insan hatibûn; Erebi hebûn, Tirk hebûn, Faris hebûn

Dûmahîk r. 11

Keya Îzol:

Zimanê Armancê divê li gora sewiya piraniya xwendevanan be

Gava Armancê dest bi jiyana xwe ya weşanê kir, gelek dijwariyên me hebûn. Wek berpirsyarekî Armancê, baş tê bîra min ji bo çareserkirina wan dijwariyan, çend hevjalên ku di nav karûbar de bûn, bi hemû îmkân û zanîyariyên xwe dixwestin ku kovareke baş derkeve. Divê em bi awakî eşkere bibêjin ku, di warê weşan û çapê de tu tecrûbên me tunebûn. Lê, li gor wê rewşê jî, cardin xwestin û daxwazeke xurt li cem wan hevalan hebû da ku bi her awayî hewil bidin ku hemû tiştên alaqa xwe bi derxistina kovarê heye, fêr bibin. Di aliyê maddî de jî gelek dijwariyên me hebûn. Di destpêkê de heta demêke dûr û dirêj jî mesrefên maddî ji alî wan hevalan dihat temîn kirin.

Helbet, çend sal bi vî rengî dom kir. Di wan salan de tecrûbên me piçêkî zêde bû, êdî kovar dikaribû bi îmkânên xwe derketa. Herweha divê em qebûl bikin ku, 3-4 salên pêşî xebatê bi her awayî bi şeweyeke amatorî berdewam kir. Wekî din jî mişkilên siyasî bûn astengên mezîn li ber me, ku Armanc bikaribe

wek kovareke bi rêk û pêk derkeve.

Îro Armanc 10 saliya xwe tije dike. Helbet meriv nikare Armanca ku îro derdikeve û ya destpêkê derdiket, bide ber hev. Biryara derxistina Armancê tenê bi zimanê Kurdî gaveke pêş û pozîtîf e. Form û şiklê wê jî li gor ya kevn, îro baştir e. Herweha rewşa amatorî ji holê rabûye û îro Armanc wek kovar bi rêk û pêktir e û wek naverok dewlemendtir e.

Lê, bi ya min, kovar yan rojnamên Kurdî yên ku îro derdikevin divê politikayên xwe yê weşanê biguherînin. Çawa?

Armanca ARMANC'ê divê li gora xwendevanên Kurdî pêk were. Wek em dizanin, kovarên yan tiştên ku bi Kurdî çap dibin, jî alî pirr hindik kesan ve tîn xwendin û taqîb kirin. Ne ku Kurd naxwazin bi zimanê xwe bixwînin. Na. Sebebê sereke ew e ku Kurd fêrî xwendina Kurdî nebûne. Xwendina bi Tirkî jî bo wan hêsantir tê. Loma, divê em naverok, şikil û forma kovaran biguherînin da ku ji bo xwendevanan interesan be.

Ziman divê li gora sewiya piraniya xwendevanan be. Naverokek jî. Divê meriv zêdetir cih bide sûretan û sernivîsan (rubrik). Xeber û nûçeyên ku dikarin întiresa xelkê bikşînin divê zêdetir di giraniyê de bin. Nûçeyên kevn ku di kovarên Tirkî de berê hatine behskirin, divê carek din neyên nivîsin. Divê xeber û nûçe çavkaniyên xwe bêtir ji civata Kurdan bigrin. Divê tiştên siyasî ne di giraniyê de bin. Lê mesajên siyasî bi wan rîyan bête şandin ji bo xwendevanan.

Helbet, hin kes wê van pêşniyaran baş nebînin. Lê, eger îro em dixwazin ku Kurd kovarên Kurdî bixwînin, divê em ji realîte û rastiyên xwe derkevin rê. Heta ku hejmar xwendevanên me zêde û sabit bibin divê ku noxtiyên li jor hatin behskirin, em bigrin ber çavan. Paşê, gava ku ev pêk hat, êdî meriv hêdi hêdi tiştên ku dixwaze bê çapkirin, têxe praktikê.

Ez hêvîdar im Armanc wê jiyana xwe wek kovareke Kurdî bidomîne û serfirazî ji bo xebata we daxwaza min e. □

Xwendevanên Hêja

Ji bo derketina rojname an kovarek çak, bi rêk û pêk û zengîn hebûna redaksiyonekê tenê, tîr nake. Hebûn û pirrbûna nûçegihanên (muxabîran) gelek muhîm e. Ev rastî her ji bo Armancê jî wisa ye. Ji bo Armanceke çaktirîn û zengintirîn me qampanya nûçegihaniyê vekirîye. Kesên ku bi me re, ji bo Armanceke dewlemend, milên xwe bide milên me, dikarin ji bo nûçegihaniyê muraceatê Armancê bikin. Divê di muraceata xwe de bi kurtî qala jiyana xwe bikin û ji bo qerta nûçegihaniyê du sûretên xwe ji me re bişînin. Kesên li welat an jî li dervayî welat dijîn, dikarin muraceat bikin. Redaksiyona Armancê heta serê salê wê bersiva hemû muraceatên hatine kirin bide.

Redaksiyona Armancê

M. Elî (Hambûrg):

Çewa meriv zimanê Ewropîya fêr dibe her wisa meriv dikare zimanê xwe jî hîn bibe

Ez wek belavkirê Armancê wexta Armancê difroşim gellek kes nakirin. Sebeb jî ev e ku, dibêjin em nizanin Kurdî bixwînin. Roja îroyîn sedî 90'ê şoreşger, demokrat û welatparêzên Kurd nizanin bi Kurdî bixwînin û binivîsin.

Ez ji we dipirsim? Ev çawa dibe? Him emê ji bo Kurdistanek serbixwe û demokratîk têkoşin bidin û him jî emê zimanê xwe fêr nebin. Hinek hene fêrbûna ziman hewaleyî şoreşa Kurdistanê dikin û dibênin qey şoreş çê bibe ewê di rojekê de zimanê xwe fêr bibin. Na xêr ev tişt, li tu derê çênebûye.

Meriv wexta li Ewropayê dimîne çewa zimanê wan fêr dibe her wisa meriv dikare zimanê xwe jî hîn bibe. Ez bi xwe li Ewropayê hînî zimanê xwe bûm û di vî warî de rola Armancê pirr bû. Lê hîn jî ez nikarim bi Kurdî binivîsim. Ez jî kêmasiyek min e.

Zimanê Armancê xweş e û zimanê xelkê ye. Lê naveroka wê bi nûçeyên aktuel bûna wê hîn baştir bibûna. Hinek hene rexne li zimanê Armancê digrin û sivik dibînin. Ez van rexna di cî de nabînim. Hêji gelek gotin hene ji me ra giran tîn.

Bi dîtina min divê Armanc di rûpelên xwe de cîyek zêde bide nûçên Kurdistanê. Ji ber ku ji Kurdistanê Îranê, Iraqê û Sûriyê jî Kurd li Ewropayê dijîn û ew nizanin li Kurdistanê Tirkîyê çî diqewimin û her wisa Kurdên Kurdistanê Tirkîyê jî li wan perçan çî diqewimin wê fêr bibin.

Armanc ji bo ziman û çanda Kurdî hêviyek e. Ji redaksiyona Armancê re serfirazî dixwazim.

Redaksiyon: M. Elî, Zinarê Xamo, Hesen Mîzgin, Lewend Firat, Mîrza Bextiyar. Redaktorê berpirsyar: M. Elî. Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmîsanîj

Adres : Armanc P. Box 6004 172 06 Sundbyberg Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC
Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigutgivare: Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen Postgato: 50 37 99-9 ISSN: 0348 7385

Husnu Okçuoglu:

"Ji bo ku ji van mirovan re nebêjin Kurd dibên pêşmerge"

■ **Angelika Beer:** "Ji bo ku doza gelê Kurd a bi heq bê pelçiqandin dewleta Alman bi Iraq û Tirkiyê re kare her bîexlaqîya bike."

■ **Husnu Okçuoglu:** "Ger hukû-

meta Tirkiyê qandî ku ehemiyetê dide heywanên çiftliga Ceylanpinarê bidana multeciyan Kurdên Iraqê ji wê rewşa wan a îro weha xerab nebûya. Ji bo ku ji wan re nebêjin Kurd, dibên pêşmerge. Çawa dibe zarok, pîrejîn, mêr gişt bi hev re dibin pêşmerge? Ev li ku dera dinê hatiye dîtin? Em ji we dipirsîn! Belê, hukûmeta Tirk bi vî rengî li mesela Kurd dinêre birayên ezîz. Hukûmeta Tirk çiqasî serê xwe têxe bin sîlikê(qûmê) û çiqas bixwaze di esase înkarkirinê de dest bavêje pîrsa Kurdî jî, îro li Tirkiyê du pîrsên girîng hene; yek pîrsa Kurd e, dudu demokrasî ye. Divê herkes vê rastiyê qebûl bike. Pîrsa Kurd ne tenê pîrsa Kurdan e, her wisa pîrsa hemû demokratên bi namûs e."



Kesên di Civîna Duîsburgê de axaftin piştgiriya xwe bi gelê Kurd re dan diyarkirin (Foto: Armanc)

Roja 15'ê Çiriya Pêşîn li bajarê Duisburgê (Almanya Federal) ji bona alîkariya multeciyan Kurdistana Iraqê şevê hat lidarxistin. Di şevê de parlamenterê Partiya Sosyal Demokrat a Gelêrî ya Tirkiyê (SHP) Arif Sag wek hunermend, Husnu Okçuoglu(SHP), Fehmî Işıklar (SHP), ji Partiya Kesk endamê Meclîsa Federal Angelika Beer, ji SPD'ê endamê Meclîsa Eyaletê Johannes Pflug, endamê Meclîsa Kilîsan Jorn-Erik Gutheil û ji Medico International jî Hans Branscheidt beşdar bûn. Şev bi tevkariya Komîta Piştgiriya Multeciyan Tirkiyê û Medico International hat amadekirin.

Hemû axaftivan li ser pîrsa

Kurd rawestiyên û bi dîr û dirêjayî qala rewşa wan a xerab kirin.

Angelika Beer bi giranî qala ziyareta xwe ya kampên multeciyan ên li Kurdistana Tirkiyê kir. Wê di axaftina xwe da weha got: "Hukûmeta Tirk tu carî nabe dostê gelê Kurd. Ji bo doza gelê Kurd a bi heq bê pelçiqandin dewleta Alman bi Iraq û Tirkiyê re kare her bîexlaqîyê bike."

Yê li ser navê SPD (Partiya Sosyal Demokrat a Almanya Federal) peyivî weha got: "Rewşa gelê Kurd gelek xerab e. Divê beriya her tiştî hebûna gelê Kurd bê qebûlkirin û mafên kulturî ji wan re bê naskirin."

H. Okçuoglu: "Ger hukûmeta

Tirkiyê qandî ku ehemiyetê dide heywanên çiftliga Ceylanpinarê bidana multeciyan Kurdên Iraqê ji wê rewşa wan a îro weha xerab nebûya. Ji bo ku ji wan re nebêjin Kurd, dibên pêşmerge. Çawa dibe zarok, pîrejîn, mêr gişt bi hev re dibin pêşmerge? Ev li ku dera dinê hatiye dîtin? Em ji we dipirsîn! Belê, hukûmeta Tirk bi vî rengî li mesela Kurd dinêre birayên ezîz. Hukûmeta Tirk çiqasî serê xwe têxe bin sîlikê(qûmê) û çiqas bixwaze di esase înkarkirinê de dest bavêje pîrsa Kurdî jî, îro li Tirkiyê du pîrsên girîng hene; yek pîrsa Kurd e, dudu demokrasî ye. Divê herkes vê rastiyê qebûl bike. Pîrsa Kurd ne tenê pîrsa Kurdan e, her wisa pîrsa hemû demokratên bi namûs e."

Hans Branscheidt jî di axaftina xwe da got; "Em wek Medico International pîrsa Kurda bi nêzikî takîp dikin û heta nuha me gelek xebat jî kiriye. Piştî bûyera Helepçe me qampanyek vekir, nêzî 200 hezar Markî pere civand. Me ev pere bi qanalên xwe ji multeciyan re şand. Em di derheq Kurdan de kovareke periyodîk derdixin. Em bangî hemû şoreşger, demokrat û hûmanîstên Alman û dinyayê dikin: Divê herkes li gor îmkanên xwe piştgiriya gelê Kurd bike."

Li dora 2500 kes di şevê de beşdar bûn.

Ji alî Komîta Çavdêriya Demokrasiyê li Tirkiyê

Komîsyona Kurd hat damezirandin

Komîta Çavdêriya Demokrasiyê(DİK) di civîna çapemenî de diyar kir ku wan wek komîte Komîsyona Kurd damezirandiye. Di Komîsyonê de, Prof. Sadun Aren, İsmail Beşikçi, Aziz Nesin, Nurettin Yılmaz, Kemal Anadol, Mûrat Belge û yên din hene.

Roja 17'ê Çiriya Pêşîn Komîta Çavdêriya Demokrasiyê civînek çapemeniyê çê kir. Di civînê de Serokê Komîta Çavdêriya Demokrasiyê da diyarkirin ku wan girêdayî bi Komîte ve "Komîsyona Kurd" damezirandiye.


Berpirsyarê DİK, got pîrsa Kurd yek jî astengên girîng in li pêşiya demokrasîya Tirkiyê, ji bo vê girîngiyê me meselê girt dest.

Di civîna çapemenî de bêtî ku navê Kurdistana bêtî dayîn, li ser bûyerên li Kurdistana dibin hat rawestandî. Di vî warî de weha hat gotin:

"Bûyerên Başûrêrojhilat (mebest Kurdistana) û şêlê destavêtina Tirkiyê van

bûyeran, tesîrê li jiyana me ya siyasî dike. Ev yek, ji her hawî û bi tevayî jî nêmoderntiya Tirkiyê tê; di qeraxê sedsala 21'an de, ji berdewamkirina zihniyeta ku ji Osmanîyan hatiye wergirtin tê. Ev zihniyet, di TRT'ê (Muesesa Radyo û Televîzyona Tirkiyê) de, dema welatên cînar jî mevzûbehîs bin cardin, bêja Kurd bi lêv nakin, û hin jî ne diyariya "unsûrê etnikî" xelas nebûne, di jiyana rojane de wek zimanê qedexekirî ev politîka bi sed şêklî dertê pêşiya me û hebûna xwe diparêze."

Prof. Sadun Aren da diyarkirin ku Komîsyona Kurd civîna xwe ya duduyan wê di 18'ê Çiriya Paşîn



Yek ji damezrênerên Komîsyona Kurd İsmail Beşikçi

de bike.

Wek tê zanîn Komîta Çavdêriya Demokrasiyê berî 6 mehan di kongra demokrasîyê de hat damezrandin. Endamên wê, temsilkarên partîyan, nivîskar, ronakbîr û mamosteyên unîversîtê û hwd in.

Pîrsên bê bersîv

Bavê Nazê

Li Parisê, di bin siya Enstîtuya Kurdî û Madam Mitterrand de konferansek navnetewî (14-15.10.1989) li dar ket. Pîraniya nûnerên hêzên me yê siyasî beşdarî vê civîna girîng bûn. Lê wek eşxas, ne wek merovên siyasî hatin dawetkirin. Gelo çima? Gelo ev cara pêşî ye ku siyasîyên me bi vî rengî tene dawetkirin?

Li gora ez pê dizanim gelek ji sekreterên partiyên Kurdî, bi mana nexweşiyê yan ji wek turîstan dihatin Mosko. Sovyetya jî mîna Enstîtuya Kurdî û hukûmeta Fransî digotin; "Em we wek merovên siyasî nikarin dawet bikin". Êdî belengazên me, ji neçarî bi riya hin partiyên Erebbên dost, li ser navê nexweşiyê ku dermanê wê li welat tunebû dihatin Mosko. Heger temsîlcîyê me nexwesta nexweşîya giran bîne ser bedena xwe ya sax selim, îca diviyabû rebeno navê dewlemenda bîne ser navê xwe û wek turîst derbasî paytexta Sovyetistanê bibe.

Helbet, hûn pê dizanin ku her du nav -ê nexweşî û sermiyandariyê- bi nûnerên me xweş nayên. Lê daxwaza ku destên xwe bihingivînin kevîrên Mosko û hevalên Sovyetî bibînin, dihişt geh ew xwe nexweş kin û geh jî xwe bikin turîst.

Li Suriyayê jî, di van deh salan de, dan û stendinek destelatê bi hin hêzên me re çê bûye. Lê belê wek eşxasan sohbetê bi hev re dikin. Li vîra siyasîyên me bi rola axe û serok eşîran radibin. Li gel ku navê axatiyê bi siyasîyên me ne xweş e jî, lê her vî tiştî qebûl dikin. Ew dilê xwe xweş dikin û dibêjin; "ma ne hukûmet û mîlet me nas dikin û pê dizanin ku em kî ne".

Hela em pê dizanin çima hukûmetên van dewletan, bi awakî vekirî, naxwazin îtirafê bi nûnerên mîletê me bikin. Lê nayê famkirin ku çima siyasîyên me vî tiştî li ser xwe qebûl dikin? Bi xwe ez fam nakim, çilo berpirsyarên me, bi rehetî dest ji navên xwe yê ku bi xwinê hatine stendin, berdidin! Gelo ji bo çûna Mosko û Parisê ye? Yan jî...

Di vî warî de, babetek din; emê bibêjin ku xelkên xerîb, ji bo parastina bercewendiyên xwe naxwazin bi awakî vekirî bi me re rûnin, lêbelê çima dezgeheke Kurdî, wek Enstîtuya me li Parisê, bi vî rolê radibe? Gelo çima Enstîtuya Kurdî bi dilêma xwe ya ilmî û çandî ranabe, lê diçe bi karekî din radibe?

Hin dikarin bi xeyd bibêjin: "Malxirabo, çilo devê te digere û tu van gotinan dibêji? Ma Enstîtuya Kurdî bi vî civînê karekî xirab kiriye? Û gelo Madam Mitterrand neqencî bi me re kiriye?"


Na heyran, îstexfîrelah! Hiç ez nabêjim ku tiştêkî xirab bûye. Lê ez dibêjim, heger Enstîtu karê xwe bike û hêzên me jî bi dilêma xwe rabin, êdî wê xebata me bi sed taqî çêtir be.

Ez dibêjim bela Enstîtuya Kurdî wek dezgeheke ilmî aliman li dora xwe bicivîne, pirtûk û lêkolîna bîweşîne. Ger ez weha jî dibêjim, bela hêzên me yê siyasî xebata ji wan tê xwestin bikin û xwedî gotinên muteber bin. Bi gotinek din, divê siyasî karê siyasîyê bikin û alim karê ilmî bikin. Lê çima, li Ewropa ev rol bi hev tê guhertin? Ez fam nakim...

Cîgerxwîn hat bibîranîn

Bi munasebeta bîranîna 5 saliya şairê bi nav û deng; Cîgerxwîn, di 22'-yê Çiriya Pêşîn de li Stockholmê ji alî Komela Kurdistan li Spangayê civîneke gelek dewlemend hat çêkirin.

Di civînê de şairê mezin Şerko Bêkes, Rojen Barnas, Cemşîd Heyderî û R. Rêving li ser şîir, jiyana û têkoşîna mamosta Cîgerxwîn rawestiyên. Hemûyên axaftivanan bi giranî bal kişandin tesîra şîirên Cîgerxwîn li ser têkoşîna rizgariya gelê Kurd. Li gel van axaftinên li ser şîir û jiyana mamoste Cîgerxwîn, nivîskar û şair Malmîsanîj jî çend şîir ji şîirên wî xwendin. Her wisa bi vî munasebetê keys kete guhdaran, ku li ser berhem û jiyana mamoste Cîgerxwîn raxistineke dewlemend temaşe bikin.



Panorama Konferansa Parîsê

Halim Can

Konferansa Navnetewî a Parîsê ku bi navê "Kurd; Mafê Însanî û Huviyeta Kulturî" di nivê meha Oktobê de bi însiyatîfa seroka Franse Liberte; Danielle Mitterand çêbû, bêguman ev ji bo pirsê Kurdî pêçveçûnek nuh e. Herçiqas di organîzasyonê civînê de kêmasiyên mezin hebûn jî ev, mana civînê winda nake. Pêwîst bû ku Konferans bi beşdarbûna hemû dezgehên Kurd -çî siyasî û demokratîk û çî jî kulturî û zanistî- pêk bihata. Lê mixabin ji alîkî ve ji ber siyaseta Fransa û ji aliyê din ve jî ji ber bêînsiyatîfîya yan jî ji ber siyaseta Enstîtuya Kurd a Parîsê hêzên Kurd wek rêxistin di konferansê de hazir nebûn. Sebeb çî dibe bila bibe ev kêmasiyê mezin e û berî her tiştî jî divê partî, rêxistin û grûbên siyasî yên Kurdan li ser vê yekê bifikirin û hewl bidin ku li Stockholmê jî xetayek wiha çênebe.

Girîngbûna Konferansê ew bû ku cara yekem di platformek wiha fireh a navnetewî de ji Yekîtiya Sovyet, ji DYA û ji hin welatên Ewropaya şex-siyet hatin ba hev û dîtînen xwe li ser Kurdan gotin. Û carek din raya giştî ya cihanê ji rewşa trajediya Kurdan agahdar bû. Bi taybetî jî çapemeniya Tirkîyê di çerçewa 7 parlamenterên SHP'ê yên Kurd de -xwedêgiravî ew bi bêdestûriya partiya xwe beşdarî konferansê bûbûn- çî dan konferansê. Rojnamevanên Tirk wek Dogu Perinçek û Ugur Mumcu di ser durûtiya xwe nişan dan. Wan tahmûl nekir ku demokrat û humanîstên Ewropî û Amerîkî di çerçewa mafê Însanî de be jî pirsê Kurdan munaqesê bikin û dîtînen xwe bibêjin.

Qerarên reel

Herçiqas Ewropî û Amerîkî di çerçewa mafê mirovî û kulturî de li pirsê Kurdan nihêrtin û meselê bi çekên kîmyayî û kampên multeciyan ve girêdan jî di konferansê de axaftînen xurt û di ciyê xwe de kirin. Lê meriv nikare bêje ku biryarên konferansê netîca van axaftînan bûn û ne jî van biryaran rewşa îroyîn ya gelê Kurd anîn zimên. Tevî vê jî ev hersê qerarên jêr, reel in û gawek bi pêş de ne. 1) Konferans, dixwaze ku nunerên gelê Kurd ji bo Parlamentoya Ewropayê, Konseya Ewropayê û ji bo hemû civînen navnetewî yên mezin bîn vexwendin. 2) Konferans, bi armanca ku di Asambla Neteveyên Yekbûyî û hemû civînen mezin yên navnetewî de statuyek nunertiyê bigre avakirina organîsasyonê ku hemû gelê Kurd temsîl bike pêşniyar dike. 3) Konferans ji bo ku li Kurdistanê Mafên Însanî bîn parastin îlan dike ku wê di himaya Komîta Swêd de, berî Tîrmeha 1990'î jî nuh ve li Stockholmê bicive.



Di konferansê de li ser çekên kîmyayî pîrr hat axaftin, lê di dawiyê de Iraq nehat mahkûmkirin. (Foto: Armanç)

Iraq nehat mahkûmkirin

Di konferansê de li ser çekên kîmyayî pîrr hat axaftin, lê di dawiyê de Iraq nehat mahkûmkirin. Yan jî piştigirî ji têkoşîna gelê Kurd re nehat nişandan. Vê yekê jî meriv fahm dike. Ji ber ku her tişt berê hatibû hazirkirin, tesîra dîplomasiya Iraq û Tirkîyê li ser hukûmeta Fransê hebû û ne mumkûn bû ku Fransa ji bo Kurdan têkiliyên xwe bi Tirkîyê û Iraqê re têxe tahlûkê. Li aliyê din jî konferans, konferansa wan bû, Kurdan di qerarên konferansê de nikaribûn rola xwe bilîztana.

Halbûkî di roja pêşîn de konferans baş derbas bû. Di roja duduyan de atmosfera konferansê hinek hat guherandin. Ji ber ku serokê dîwanê -ku berpîrsiyarê mafê Însanî û sekreterê dewleta Fransa Dr. Bernard Kouchner bû- xwest ku berpîrsiyarê "Herêma Otonoma Kurdistanê" bi navê hukûmeta Iraqê bê di konferansê de biaxive. Li ser vê yekê di salona konferansê de qelabalixî çêbû û gelek kesî nexwestin ku ew bê di konferansê de biaxive. Celal Talabanî bi qerardarî li dijî wî kesî sekinî û di axaftîna xwe de got ku "Em sipasiya hukûmeta Fransa dikin ku ev konferans organîze kiriye, lê gerek xelkê Franse zanibe ku ev kes jî alî gelê Kurd ve xain hatiye îlankirin, heger ew bê biaxive, emê salonê terk bikin." Celal Talabanî rast digot ew kes ne bi xwe teref bû, lê tiştên ku dihat gotin ev bû; wê Danielle Mitterand biçûya Kurdistanê Iraqê û ji bona vê jî, yek wê li ser navê hukûmeta Iraqê bihata di konferansê de biaxivîya. Hukûmeta Iraqê jî ev kes şandibû. Iraq qey di armanca xwe de bi ser neketibû loma jî piştî Konferansê îcar li balyozxana Iraqê a Fransayê şevêk çêkir û Danielle Mitterand û Bernard Kouchner jî ezimandin vê şevê. D. Mitterand neçû, B. Ber-

nard jî sekreterê xwe şand.

"Meriv dostê we be jî zahmet e"

Bersîva Dr. Kouchner Kurdan gelek aciz kir. Heta hinek Kurdan digotin ku berpîrsiyarê hukûmeta Iraqê bihata biaxifta, wê jî gotînen Dr. Kouchner çêtir bûya. Gotînen Dr. Kouchner ev bûn: "Amadekirina vê konferansê ne hêsan bû. Gerek hûn vî tiştî fehm bikin. Meriv dostê we be jî zahmetiya wê heye. Feyde tê de hebû ku we guhdariya dijmînê xwe jî bikira. Lê belê ne li ser redkirina we, ew bixwe nehat."

Lê belê Dr. Kouchner zû jibîr kiribû ku di destpêka vê salê de li Parîsê konferansa çekên kîmyayî çêbibû û ên ku bûbûn qurbana van çekan jî alî konferansê ve nihatiyên vexwendin.

Rast bû, rêxistinên Kurdan bi fermî di konferansê de hazir nebûn lê bi fiilî serok yan jî berpîrsiyarên wan li konferansê bûn. Ew herçiqas bi navê partî û rêxistinên xwe ne axaftin jî lê dîtînen partî û cephe xwe gotin. Dr. Mahmûd Osman eşkere bi navê Cepha Kurdistanê Iraqê peyivî. Him xanima rehmetiyê Dr. Qasimlo û him jî Hesen Şerefî rewşa siyasî û civakî ya Kurdistanê îranê û têkoşîna PDK-î anîn zimên. Alî Akbaba ku li ser rewşa hefsên Tirkîyê peyivî propaganda PKK'ê kir. Berêz Kemal Burkay her çiqas li ser "Di huqûqa Tirkîyê de Kurd" peyivî jî, lê firsetek bû û dikaribû bahsa TEVGER'ê, armanç û hedefên wê jî ji konferansê re bikira. Lê berêz K. Burkay ev nekir, bahsa tadayiyên ku li berpîrsiyarên kovara "Özgür Gelecek" dibin kir. Lê wî jibîr dikir ku kovarên Kurdan yên din jî hene ku li Tirkîyê derdikevin û berpîrsiyarên wan jî di bin êrîşa dewletê de ne.

Bi kurtî ev bû panorama Konferansa Parîsê. ■

Stiriyên me

Lawikê Berrivani

Bekçî

Serokkomarê Tirkîyê General Evren berî ku kursiya xwe dewrî Turgut Ozal bike ji Xwedê re dua dike, dibêje, "Ya Rebbî heta îro min ji te çî xwest te da min, te ez kirim Serokkomarê Tirkîyê. Bi saya vê yekê li welêt dera ku min teftîş nekir nema. Lê heger tu dua min qebûl bikî, berî ku ez meqamê xwe dewrî Ozal bikim ez dixwazim ku carê jî cehennemê teftîş bikim".

Xwedê, dua Evren di cî de qebûl dike û ji bo rêberiyê jî, jê re milyaketekê dişîne. Her du bi hev re diherin cehennemê. Evren mêze dike ku wa ye di hewzekî gelek mezin de Însan di nav qîr û qîtranê de pilqe pilqa wan e, dikelin. Û li dora hewzê jî zebaniyekî tu dibê zebelîh, darekî dirêjê hesinekî wek milêbê sertûj di desta de, li dora hewzê dihere û tê. Ewren meroq dike û ji milyaketa kêlek xwe, wezîfa zebanî dipirse. Milyaket dibêje "Ew bekçiyê ser serê wan e. Ji wan, gava yek serê xwe ji nav qetranê ku dikele, derdixe, ew jî bi wî hesinê sertûj ê di dest de li serê wan dixê, wan cardin di binî ve dike. Kesên di vê hewzê de giş bédin, bêiman û kafir in, bi vî hawî cezayê xwe dikşînin".

Ji wir didin rê, diçin ser hewzekî din. Ew hewzê jî wek ya berê di serê Însan û zebaniyek li ber bûye. Cardin li ser pirsê Evren, milyaket gotiye, "yên ku di vê hewzê de dikelin, gişên wan Muslimanên gunehkar in, munafiq in, ew jî di vê hewzê de cezayê xwe dikşînin. Kî serê xwe ji nav qetranê derxe, bekçî bi wî hesinê di destê xwe de li serê dixê, dike binî. Divê tu kes serê xwe dernexe".

Ji wir diçin ser hewza sisyan. Li ser pirsê Evren, milyaket dibêje "Ev hewzê ya Kurda ye. Ji miliyetçiyên bigre heta komunîstan, hemû Kurd di vê hewzê de cezayê xwe dikşînin". Evren bala xwe didê ku ev hewzê be bekçî ye. Ev yek pîrr bîna Evren teng dike, ji milyaket re dibêje, "Her du hewzên din bi bekçî bûn, çima yê vê hewzê tune? Milyaket dibêje, "Ev hewzê ne hewcî bekçî ye, ji ber ku, ji wan dema yek serê xwe derxe, yê binî tavilê bi nigê wî digre û di serê bin ve dike. Lema jî bekçî li ser serê wan tune..."

Piştî ku min di Kurdistan Pressê hejmarê 75'an de nivîsa li ser TEVGER'ê dit, ev meteloka ha ku min carê di derekê de li ser çepê Tirkan xwendibû jî nuh ve bi bîra min ket û min ew tatbîqî Kurdan kir; ji ber ku bêtir li wan tê.

Xwedêgiravî li ser îstîfa hêzekê(!) ji nav TEVGER'ê, (Di esasê xwe de tu hêzê jî TEVGER'ê îstîfa nekiriye, şexsek ji PARHÊZ'ê qetiyaye û li dijî hevalên xwe û TEVGER'ê nivîsek nivîsandiye. Rastiya çiroka 'terk-lêketina' xaniyê TEVGER'ê ev e) K. Pressê bi puntoyên mezin manşetek avêtîye, gotiye, "Xaniyê TEVGER'ê terk lê ket!" Heger min xwediyên K. Pressê nas nekirana, bi rehetî min dikaribû bigota, "ev rojname ne ya hêzeke dost e", ji ber ku ziman, ne zimanê "dosta" ye û bê mesûliyet e. Bi vê veqetandinê kêfa hevalên K. Press hewqas hatiye, tu nemaye ku destên xwe hine kin. Hawakî wer dane nivîsê, fena ku di herbê de cepha dijmîn belav bûbe. Em bibêjin "Xaniyê TEVGER'ê terk lê ket" ya jî tew ji bin de hilweşiya, gelo wê çî kurkê li xwediyê K. Pressê be. Bi rastî ez tê nagihîjim...

Nexwe ne bê sebeb bûye ku di cehennemê de li ber hewza me bekçî tunebûye, çimkî em giş bekçiyên hev in...

Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Abdurehman Axayê
kurê Şahîn Axa -6-

Evaye çîroka jîna min ji ewelê
umrê min heya tarîxa sala 1976

Xelasiya min ji hefsê, destpêbûna Şerê Cîhanê yê Duduyan

Dema ifada min digihîje musteşar, aciz dibe, zebîbî destê xwe dinivîse li ser min, rêdike pey Naîfê Paşê û Hecî Abdilkerîm digel hevalên me; Agît Axa û Hecî Huseyîn Axayê Endîwerê û Gebrû û Mensûr Bihnan. Ji wan re dibêje: "Lazim e hûn vê zeptê îmza bikin." Radibin hemî jê re îmze dikin. Pişt re ji wan re dibêje: "Ahmedê Abdurehman gilehê min kiriyê." Di zeptê de dibêje Ahmedê Aburehman ne uzwe lejne ye, zilamek wetenî ye, tehrîba silaha dike, rêdike ji weteniya re. Zilamek derew çî ye, her ticareta sileha dike. Ewî ifade da ku xwe pê xelas bike. Ew zilamên ku me navê wan nivîsî hemûyan zapta musteşar îmza kirin, rêkirin muhkema eskeriyê li Beyrûdê. Du hîva ez mam di hefsê de. Pişt re ez birim mahkemê, ji min re gotin: "Ew herdu tîveng ên te ne?" Min ji wan re got: "Belê ên min in." Ji min re gotin: "Ji bo çî te kiribûn?" Min got: "Ji bo muhafa xwe." Gotin: "Tu çî ji mehkemê dixwazî?" Min ji wan re got: "Ez merhametê dixwazim û beraeta xwe." Min ji mahkemê re got: "Ez hevî ji mahkemeya hewe ya mezin dikim, ezê çend kelîma bêjîm eger îzîn hebe, ji min re gotin: "Bêje." Min ji wan re got: "Ez hevî ji siyadeta reis digel uzwe wî dikim ku ew zulma musteşarê Endîwerê bi min re kir hûn wê zulmê bi min re nekin. Musteşar ji min re gotibû eger tu gumruka herdu tîvinga bidî ez ewraqê te rênakim Beyrûdê. Li ser şerefa wî min 20 zêrê zer da, dîsa ewraqên min rêkirin Beyrûdê. Kî ji min re bêje ew musteşar ne Fransawî ye. Çima zilamê Fransawî tiştê bêje wê xwediyê gotina xwe be. **Me terka millet û wetenê xwe kir ji ber cewr û zilma Tirkan, me îltica bi hukûmeta adil a Franse kir da hûn huqûqên me muhafa bikin. Hûn ji Tirka xirabtir tinin serê me, rê ji me re nema, lazim e erd biqelîşe em herin bin erdê.**"

Dema min ev gotin ji wan re got, reisê mahkemê kenîya, ewraqên min xwendin, heya xilas kirin, pişt re mezbeta ku musteşar li ser min nivîsibû ew xwend heya xilas kir. Pişt re me-

hamiyê min difaa min kir ribik seet, ez ji mehkemê birim salonê, şirtê Fransî bi min re ye, ji min re got: **"Tu hukum kirin heşt meha, lê hêj hukmê te di muzakerê de ye." Pişt re yê şirte ez birim mahkemê, hakim ji min re got: "Me te hukum kiriye çar meh û sed firing zêr, eger tu bi hukmê xwe ne razî yî, 24 seet muhlet ji te re hene ku tu hukmê xwe îstînaf bikî."** Min jê re got: "Ez bi hukmê xwe razî me."

Min heyva xwe qedand, ez berdama ez çûme mala xwe; bajarê Dêrikê, nas û dost hatin serdana min heya heşt rojan. Pişt re ez çûme Endîwerê mala Hecî Abdulkurîm, min jê re got: "Lazim e tu bi min re bîyî em herin cem musteşar." Ji min re got: "Evarê emê herin." Ji min re got: "Ya seyda ziravê te yê şera ye, çawa te gilehê musteşar kir?" Min jê re got: "Min kir min qenc kir." Çawa çebî?" Li min vegehand "tu çenebî." Pişt re Naîf Beg ji hat min jê re got: "Hewe mehdara min li cem musteşar kir, ez nedam xatirê we, pişt re hewe li ser min mezbeta musteşar îmza kir." Ji min re got: "Me newêrî em îmze nekin, eger li ser kurê min biya jî minê, îmze bikira lazim e tu qusûra me efû bikî."

Ez mam li mala Hecî Abdulkurîm heya evarê, min jê re got: "Kerem bike em herin cem musteşar." Ji min re got: "Heya sibehê", sibehî ji min re got: "Ez newêrim, çima te gilehê wî kir." Ez tenê çûm. Katibê musteşar li salonê bû, dema ez ditim rabî ji piya, min silam kirê, me destê hev girt givaşt, ji min re got: "Te xê re, te çî divê?" Min jê re got: "Ezê herim ziyareta musteşar", ji min re got: "Ehlen" derî vekir, jê re got: "Ahmed hatiye ziyareta te." Musteşar jê re got: "Bîla bê." Dema ez çûm destê min girt û hêjand got: "Bonjur" cigare da min, qahwe ji min re anî, min qahwa xwe vexwar. Got: "Mahkema..... tu hukum nekîrî." Min jê re got: "Ez hukum bûm çar meha ew ji bi saya serê te bî, ew hukmê hindik dane min, çima ku te ewraqê min xweş nivîsibî. Yê xelkê tîvingek bi wan re digirtin,

çar sal hukum dikirin, yê min du tîving bûn çar meha ez hukum kirim. Eger te baş di heqê min de nenivîsindibiya wê çar sal bidana min." Dema min ev jê re got serê xwe nizim kir. Min jê re got: "Ez hatime cem te tu îzna min bidî ezê mala xwe ji Dêrikê bibim, kî çî di heqê min de bêje bawer nekî." Ji min re got: **"Lazim e ticaretê bi sileh nekî." Min jê re got: "Tu zanî û herkes ji dizane min ticaretê bi sileh nekiriye, belê te ez kirim qurban ji ehle Cizîrê re, te tîvingên min avêtin gumrukê."** Ji min re got: "Tu yê herî ku da?" minjê re got: "Ez herim ku da ezê herim" Ji min re got: "Min îzna te daye tu herî kuda kî çî di derehqê te de bêje ez bawer nakim." Min xatir jê xwest ez çûm mala xwe Dêrikê.

Piştî çend rojan min mal bar kir, ez çûm gundê Mistefa; wî yê li cem Şêx Abdulahê Şêx Mihemedê Nûrî rehmeta Xwedê li ser ruhê wan be, çar meha ez mam, piştî çar mehan ez vegeyayam bajarê Dêrikê. Perê min neman ez mam bê şîxul û bê emel.

Rojekê ez çûm sükê, yekî fileh navê wî Gurgîs bî, dikana Şêx Elî û Şêx Abdurehman ji wan kiribû, ku muhlet heya şeş meha perê wan bide wan. Min ji yê file re got: "Tu dikanê nadi min ku çawa te ji wan kirî." Ji min re got: "Min da te belê meqer ji min re heya şeş meha, tê perê Şêx Elî wan bidî wan." Min qebûl kir mifta dikanê ji da min, ez di dikanê de rûniştim.

Şêx Elî wê biçûya bubûya meleyê Girdehol û Şêx Abdurehman wê bubûya meleyê koçeran. Çima dikan firotin; salekê şîxulîn qurşek feyde nekirin. Pişt re min ji Şêx Elî re got: "Ez nahêlim tu herî bibî meleyê Girdehol, ez û te emê bibin şîrikê hev", got: "Baş e". Sibehê ez û Şêx em çûne dikanê. Deh roj buhurîn rojê Şêx Abdurehman ji nava koçeran hat, rênî ez û Şêx Elî şîrik in. Ji me re got: "Ez hevî dikim hûn min jî bikin şîrikê xwe, hema em sê bira." Min jê re got: "Tu jî şîrikê me, em sê bira." Em tev de man heya heşt meha. Dilê min û Şêx Elî ji hev ma, em jî şîrikîya hev ketin me hesabê

xwe kir, her yekî ji me hezar kaxidê Sûriyê gihayê ji bilî mesrefa malê. Şêx Abdurehman hevî ji min kir got: "Tu dev ji me bernedî em nizanin kirin û firotinê, ez û birayê xwe Şêx Elî em temamî bi salek man di dikanê da me kaxidek Sûriyê feyde nekî." Min li vegehand: "Dil şûşe ye wexta bişkê nahê cebirandin."

Sala 1941'ê ez û Mihemed Sûrê Êrsî bûne şîrikê hev. Di wê salê de Herba Alemî ya Duduyan dest pê kir. Me rênî mayina me li Dêrikê ez û Mihemed ê bêne kuştin bi destê fila. Me mala xwe digel dikanê barkir em çûne gundê Ilwankê. Me gelek genim kirî bi cil û cawa. Qederê mehekê em man li gundê Ilwankê, pişt re me bar kir em çûne gundê Qas-tepanê. Piştî sê meha ez û Mihemed ji şîrikîya hev ketin, min mal barkir ez çûm Xîrbê Bilîka li devê xeta Tirkîyê û Sûriyê, em mane heya biharê. **Wê salê xelayek mezin li Tirkîyê çêbû, dihatin cehê rizî yê binê çalê dikirin çewal, bi sed kaxidên Sûriyê. Hingê perê Sûriyê bi qîmet bî.**

Biharê me mala xwe bar kir Abrê, min dikan danî, min du hêştir kirin dan mirêba cot ji me re kirin. Min malê fatûra difrot him di bere re pez û ga û hêştir û hesp min dikirî û difrotin. Çar sala ez mame li Abrê.

Roja em ji Dêrikê derketibûn, roja paşî; Misilman û File bi hev ketin. Misilmana bazda çûne gundê Qeza Recebê. Îngilîz gihîştê Dêrikê. Ji beriya Îngilîz bi-gihê Dêrikê misilmana dora Dêrikê girtibûn wê hucûm berdana ser file Dêrikê. Îngilîz hat file çûne cem Îngilîz şikayeta misilmana kirin. Îngilîz ligel fileya hucûm dane Qeza Recebê, çar mîr hatin kuştin, Qeza Recep şewitandin, şereke pir zor çêbû, misilmana bazdan çûn Tirkîyê. Îngilîz Sûriye hemû vegirt. Ji beriya Îngilîz, Alman Sûriye vegirtibî. Leşkerê Farnsa yê di Sûriyê de hemû ketibî bin hukmê Alman.

Sûriyê bi siyaseta Îngilîz ji Sûriyê derxist istîklala xwe stend bi rehetî di sala 1946 de.

Pişt re ji Abrê me bar kir em çûne Qamişli sala 1946. Ez û Mihemedê Êrsî bûne şîrikê hev heya salekê.

Sala 1947 ez mam bê şîxul. Perê ku di destê mi de bû, min hemû xwarin, ma di destê mi de hemî 2300 kaxidê Sûrî. Mi bi 10 hezar kaxidê Sûrî min xanî ji firot. Mela Tahir kurê Mela Hamid mala xwe ji Girziyaretê Ebasa anî Qamişli. Çima ku Hecî Yûsifê Êrsî wade yanî soz pêra dabi: Eger tu bîyî Qamişliyê ezê arikariya te bikim. Dema hat arikarî pê re nekîr. Dîsa wê mala xwe vegehand Girziyaret. Min jê re got "Ez û tu bibin şîrikê hev, ez nahêlim tu herî gundê Girziyaret." Em bûne şîrikê hev, tu bêjî yek kaxedê Sûrî li cem Mela Tahir hebe, tune. Me firxiya dikana Hecî Yûsifê jê kirî bi 800 kaxedê Sûrî bi molet heya sê meha. Sala 1948 ez çûme Helebê, min malê fatûre ji Helebiya kirî û rê kir Qamişli. Ha min dikan tijî kir. Me kirin û firotina xwe kir heya bû pahîz, Çiriya Paşî kirin û firotin nema. Komiyalî çûne protestoyê çima ku resmalê me tunebî. Hezar kaxedê Sûrî miratê xwestiya wî gihîştê Mela Tahir. Ji min re got "Ezê firaxiya dikanekê ji xwe re bikirim". Min jê re got "Lazim e tu wan hezar kaxedê Sûrî bidî min, ezê rêkim ji Helebiya re". Ji min re got "Ez nadim". Min jê re got "madem tu nadi, emê hesabê dikanê bikî ji hev başqe bibin". Me hesabê dikanê kir ma firaxiya dikanê. Me dikan hesab kir: hezar kaxedê Sûrî. Mela Tahir ji min re got "Li ser min 1500 kaxedê Sûrî". Min jê re got "Ya bira wan pera bine emê rêkî Helebiya re, dîsa em şîrikê hev". Ji mi re got "Na". Min zen kir perê wî nine di dikanê de. Divê ez zêde pera bidimê. Deynê Helebiya ji min dihat xwestin. Mi jê re got "Tu perê te di dikanê de nine, lazim e dikan ji mi re be". Wî got "Ez qebûl nakim". Em çene dikana Hecî Yûsifê Êrsî ji me re gotin heçî ji hewe kî dikanê zêde bike, dikan ji wî re ye". Ez heyirî mam. Min zen kir divê ez hin pere bidimê. Min jê re got "Deynê Helebiya jî li ser te, tê bidî". Got "Ezê bidim". Mi bawer nekîr ku pere li cem hene. Min jê re got "Ka 1500 kaxedê Sûrî".

(Dom dike)

Glasnost di nav Kurdên Sovyetî de

Rojname Riya Teze, di hejmara xwe ya 27 (4181) de axaftinên civîna ronakbîrên Kurd ên Ermenîstana Sovyetî da çapkirin ku ew axaftin li ser rewşa civaka Kurd û berpirsyarên xwe-nûkirina rojnamê radiwestin. Em ji bo agahdariyê axaftinên vê civînê ji bo xwendevanên xwe çapdikin.

Bi xebardana destpêkê, redaktorê rojname Titalê Efo civîn vekir. Ewî kesên hazir bi dilovanî silav kir û got: -Me hûn ji bo ku, em bi we bişewirin, fikrên we bizanibin, gilî-gazinên we bibhîzin, em çawa bikin ku wekî xebata me wê hîn baş be, rojname hîn tam bigihîje meremê xwe? Hazir gişk zanin ku rojname me, rojname res-pûblîkê ye (komarî ye), armanca xwe ya sereke ji bir nekirîye û ji bir nake: Pirsên qedandina qirarên partî û hukûmatê, propagande û şirovekirina wan qirara wê di rûpelên wê da mînanî hercar cîyê lazîm bigrin. Rojnameyê dîsa her tiştî bike, ji bo ku hereketa xebatkaran bicivîne ser hev bona emir-da mîyaserkirina têradîtinêd partî (ya)ye. Pê ra bi teyayî, em dixwazin ku rûpelên rojnameyê bi qiniyatên ûsa va ji bixemilînin ku xizmetî perestroyka ye bikin, xizmetî wê yekê bikin ku paşmayînen zulma giran-erdhejê zû bêne hildan, birîn zû kew bigrin, Êrmenîstana hizkîrî hê gul vede, xizmetî şuxulên qewînkirina biratiya nav cimatên Sovyêtîyê da, zû hildana kêmasiyên heyî bikin. Em dixwazin, wek rojname hê kardar xizmetî xelkê cumhûriyetê ye Kurd bikin, bi xem û xiyalên wan ra bijîn.

Serekvaniya Ermenîstanê evan yekan ji me dixwaze. Emê ûsa ji bixebitin. Di serê serî da ez dixwazim ji we ra bêjim, wekî kolektîva rojnameyê kolektîveke ne xirab e xwedî tercubeyên baş e. Lê, wekî di nava her xebatekê da, di nava şuxulvanîya me da ji kêmasî hene. Em dixwazin sebebên kêmasiyên cîgirtî bibînin, rê-dirba kivş bikin ku van kêmasiya ji navê rakin. Armanca civîna me ji xwe ew e, wekî nava xebata me ye vir ha da wê îdî(êdî) nayêne wekilandinê. Qîmeta xebat û kirînen her endamekî redaksiyonê wê anegorî mîyaserkirina nê û meremên başkirina rojnameyê be.

Em hêvî dikin ku hûn fikir, gilî-gazinên xwe îro bi hawakî aza, bê vekîşandin bêjin. Dixwe-

zim dîsa bibêjim, nêta me ew e ku rojname bi dilê xwendevanan be, bi wan ra bibe heval û hogir, şewirdar û piştevan. Eger hûn îro bi sidqê qenc, rast û xêrxwazî xebata me qîmet bikin, derheqê şaşî û kêmasiyên me da xebardin, wê çaxê divê "pozê me bişewite", em ê rabine xîretê bona wan pirsdanîna bi serfniyazî safî bikin, ku niha li pêşîya me sekinîne.

Rast e, me pir-hindik haj ji problemên xwe hene. Lê, fikir, gilî-gazin, temî û şewrên we cihê ne, ew ê bona me gelekî kêrhatî bin.

Maksîmê Xemo (Kandîdatê ilmê filolojiyê):

Tiştêkî şabûnê ye, rojnameyê rêk ha daye pêşîya xwe, dixwaze bi alîkariya xwendevanan xebata xwe bide pakkirinê, kêmasiyên xwe jî, valayiyên xwe jî li ber cimetê vedike. Gotina rastî xwendevan ji xebata rojnameyê bi gazin in. Sebeb başçe-başçe ne. Berê ewlîn, xwestina min a mezin ew e, wekî rojnamevan di nava xebata xwe da helal bin, tu cara ji bir nekin, ku hûn bi xebata xwe va xizmetî civatê dikin. Nava salên dirêj da ye ku bi rojname "Riya Teze" ra girêdayî me. Gelek miqalên min ên ilmî ye usa hebûne, min wextê da dane redaksiyonê bona çapkirinê, lê ew di rûpelên rojnameyê da derneketine. Sebebên çapnebûnê diyar nîbûne.

Pirsa duda, ku tebatîyê nade min, ew pirsê termînayê. Gelek termîn hene, wekî sînonîma wan di nava xebardana cim'etê da hene. Divê em li ser vê yekê kûr bifikirin. Termînologîya rojnameyê û para radyoyê xebardana Kurdî yek nîn e. Divê em li ser termînologîyê tomerî hîmbin. Koma termînologîyê, ku wê teze bê teşkîlîrînê, gerek e bi hûrgilî ser wan pirsan bixebite. Lazîm e Kurdzan, rojnamevan, şair û nivîskar, hetanî merivên sade ye ûsa ji tevî xebata wê komê bibin, ku zimanê cim'etê rind zanin.

Bi texmîna min, rojnameyê divê timî rûpeleke xwe pêşkêşî pirsên

Kurdzaniyê bike, çimkî di wê derce da li welatê me bi gotineke din li Ermenîstanê, xebateke mezin tê kirinê û kutasî divê rojnameyê derheqê Kurdzanê biyanî da timî binivîse, xebata wan divê bê şêkirandinê.

Kutasîyê da ez dixwazim bêjim, ku bi xwestina redaksiyonê çend sal berê li Moskovayê ulmdar Çerkezê Beko binaxêd rastnivîsandina Kurdî bi ulmî bêcer kir û di kitaba xwe da neşir kir. Lê, heyf ew nayê xebitandinê.

Çerkezê Reş (Kandîdatê ilmê filolojiyê):

Ez jî li ser wê fikrê me, ku rojname "Riya Teze" ji xwe re riya werguhastinê girtiye. Ev tiştêkî şabûnê ye, tiştê bimbarekkirinê ye.

Pirsa sereke, belê, ziman e. Lê werin em naverokê ji bir nekin. Gelek neşirkirinê "Riya Teze" hene, ku ji aliyê serecemê da sist in, ji ruh û dilê xwendevana ra xebat nadin. Rojnamevan divê qedrê qelema xwe, qolê xwe bigre. Divê qelpiya nivîsarê tunebe. Di dawa xebata efrandariyê da eva nexweşiya lap e mixenet e.

Çi dimîne derheqê levz, zimanê xudanê miqala da, divê ew wisa bêne xweykirinê. Sernivîsarêd miqala jî divê textbext, bêyî xudanê miqalê neyêne guhastinê.

Rojnameyê ji aliyê xeml û rewşa xwe da nakeve çav. Ew betreng dertê.

Rubrikên rojnameyê ye baş tunene. Eger hebin jî, ew jî ne yê xwexwetiye ne. Bi vê yekê ra girêdayî dixwazim pêşniyarekê bikim: Lazîm e rojname hertim vegere ber bi dirokê, rubrika (sernivîsar) teze veke, mesele, "ji rûpelên diroka salên 30'î û yê nava yîn.

Ji we va eyan e ku li gelek welatên Ewropayê merkezên Kurda ye kulturîyê û rêxistinên cuda-cuda hene, bi Kurdî gelek rojname û kovar çap dibin. Minê zef bi-xwesta ku di derheqê xebata wan ocaxêd Kurdî yê hewaskar da carna rojname "Riya Teze" pêşda bi-hata.

Ez wek literaturzan dixwazim tiştêkî bêjim. Talebext ra di van salên dirêj da literaturzanî di rûpelên rojnameyê da nayê kivşê.

Lazîm e derheqê hemû kitêbên me ye çapbûyî da rêşênziya bêne neşirkirinê, ew bi objektîvî bêne qîmetkirinê. Wê yekê ra girêdayî

dixwazim rojnameyê cerga "Klasîkê literaturza cim'eta Kurda", ku çend sala pêş da vebûbû, niha dîsa pêş da bibe.

Ahmedê Gogê (Serwerê para radiyoxebardana Kurdî):

Divê em ji cim'etê hîn bin. Enstîtuya dereca ewlîn cim'et e. Ya sereke ew e, wekî em timî cim'etê ra xebardin. Rojname "Riya Teze" gerekî di nava xebata xwe da guhdariyê bide ser curê rastnivîsandina navên dinê zanebûnê lazîm e wek ku cim'et dibêje ûsa binivîsin.

Bi texmîna min wê gelekî baş be, eger di rojnameyê da car-carna şiklêd întelegensiya me derkevin. Bona çî? Çimkî cim'eta me wana pak nas nake. Em ji cim'etê dîr ketine.

Nava neşirkirinê xwe da lazîm e rojnameyê guhdariyê bide ser pirsên ûsayê ferz jî, wek etîka, marîfet û kultura berberbûnê. Cahilên me bi gelek tiştî nizanin, ji wana gelek nizanin ku wê çawa bi merivê bi emr ji wan mezintir ra xebardin. Cim'eta me cim'eteke maqûl e. Divê em vê yekê ji bir nekin.

Nûra Cewarî (Kandîdata Hunerzaniyê):

Divê rojnameyê gotî pirsên ûsa di rûpelên xwe da bilind ke, ku tebatîyê nadine cim'etê. Divê ew alîkariyê bide wê, ji we ra bibe piştovan. Mesele, em hildin pirsê "Musulmaniye"- "Ezîdîtiye".

Ji me ra ocaxêke kulturîyê lazîm e. Rojnameyê divê pêrsê bilind ke. Eva yeka xasma ji cahilên (xort, ciwan) me ra gelekî lazîm e. Eger ocaxêke kulturîyê li bajarê Êrivanê bona me bê sazîrînê, wê çaxê em dikarin di wê da kitêbxana Kurdî vekin. Ne axir gelek kitêbên me jî wenda dibin.

Wext e ku em guh bidne ser cahilên xwe. Rojnameyê gerekê hertim derheqê cahilên xwe da şîretan binivîse, wana bide ruhdarkirinê. Cahilên me layiqî wê guhdariyê ne.

Simoyê Şemo (Şair)

Rojnameyê tevî miqaledara çawa lazîm e wer naxebite. Serwerê parên redaksiyonê divê bêyî xudanê miqala guhastina nekne nava miqala.

Em di rûpelên rojnameyê da di derheqê diroka cim'eta xwe da kêr neşirkirina dixwînin. Ji vir û ha

da divê miqalên derheqê problemên dirokî ûsa bêne çapkirinê, divê bersîva sê pirsê tam hebe: Em kî ne? Ji ku hatine? Niha di çî halî da ne? Van axiriya li ser pirsê bê-tifaqiya cimeta me ra girêdayî rojnameyê gelekî dinvise. Ew tiştêkî baş e. Gilîyê min derheqê wan meriva da ne, ku pirsê "Surmaniye" û "Ezîdîtiye" tînin ortê.

Berê rûbrîkeke rojnameyê ha hebû: "Gezgek". Nizam çime ew niha hatiye ji birkirinê. Gerek ew di rûpelên rojnameyê da dîsa bê kivşê.

Em ji bir nekin, ku rojname "Riya Teze" ûsa jî dikeve destê Kurdên welatên mayîn. Bawer bikin ew nikarin rojnameyê bixwînin, çimkî elfaba Kurdên Sovyet û Kurdên welatên dereke hevdu nagire. Wê gelekî baş bûya, eger elfaba rojnameyê bubuya ya Latînî. Ulmdar, zimanzanên me divê ji niha da derheqê wê yekê da bifikirin, ber organên hemcab pirsê pêşda bikşînin. Lê, lazîm e, wekî ev pirsê bi aqilane bê munaqesekirinê.

Memoyê Xalit (Mamoste, KM PK Ermenîstanê, kandîdatê dirokê):

Îro li welatê me ji bona cim'eta Kurda gelek mecal tene sazîrînê, vatîniya me ye ku em wan mecalan hê bi kardarî, bi aqlane bidne xebatê, ji bo ku cim'et bikaribe bêtir gulvede û pêş da here.

Belê, cim'eta me wekilêd întelegensiya xwe pak nas nake. M'ena sereke ew e, ku em kêr diçine nava cimetê. Rojnameyê mecaleke ûsa kêrhatî ye, ku dikare me bi cimetê ra bide girêdanê. Ew gerekê derheqê ewledên cim'eta me ya hêja da di rûpelên xwe da hertim qinyatan çap ke.

Ne hewceye ku em îro tiştê ji hev veşêrin. Îro nava cim'eta me da nexweşiya din bûye bela. Gilîyê min derheqê dûtîretîya mîlet da ne. Pirsê ku we kir, "Ezîdîtiye" û "Surmaniye" kî tîne ortê? Merivên nezana, ku dixwazin hurmeta erzan ji xwe ra qazanc kin. Tiştêkî baş e, ku rojname "Riya Teze" dest bi serkariya miqabilî merivên ûsayê dûmedîtî bike.

Li vê derê, di derheqê sazîrîna ocaxa kulturîyê li bajarê Êrivanê, diha rast merkeza kulturîyê da hate peyivandin. Ev pirsê wê zûtîrekê bê sazîrînê. Lê dîsa tifaq û komekdariya we lazîm e. Hilbet, vekirina merkeza kulturî wê qew-



Maksîmê Xemo

Çerkezê Reş

Ahmedê Gogê

Nûra Cewarî

Simoyê Şemo

Memoyê Xalit

Karlanê Çaçarî

Vezîrê Eşo

Şekroyê Xudo

Kinyazê İbrahim

HEVPEYVÎN HEVP



Fêrikê Üsiv

Celîle Celîl

Şîraliyê Ahmed

Tosinê Resît

Hesenê Üso

Ezîzê Gerdenzerî

Eskerê Boyîk

Elîxanê Memê

Ezîzê Cewo

mandineke mezin be. Di wê da wê kitêbxane, muzeyên cuda-cuda, komên xwe efrandina bedewetiye, parên mayinê hebin.

Bi texmîna min, tema dostiya cim'eta bona rojnama "Riya Teze" tema sereke bûye. Lê di vê dercê da, em li xwe mukur bîn ku hemû neşîrkirin ne ser dereca lazim bûnê ye. Pirsên tîkiliyên miletiye pirsne nazik in.

Wext e, ku miqaledarê rojnamê yê mexsûs, yanî neşîtat, ne ku tenê li çend nehîyên cumhûriyetê hebin, lê ûsa jî li derî sînoren wê jî divê hebin.

Karlanê Çaçanî (Kandîdatê ulmên dîrokê)

Rojname divê, bibê mecala pêşdebirina huceta. Rûpelên wê da divê derheqa pirsên cuda-cuda de hucet bê teşkîlîkirinê. Û bona wê yekê gerekê mecala rojnamê jî hebe.

Derheqa rubrikayên rojnamê da hate xebirdan. Minê bixwesta, wekî ev rubrik jî di rojnamê da bihatana kivşê: "Para lîteratûrê", "para kulturê", "para bedewetiye" û ên mayîn.

Civînen bi vî cureyî, hilbet, kardar in. Lê wê diha baş bûya, eger li rex rojnamê, kovareke politîkîyê -mexlûqetîyê- bedewetiye ku ji çend meha carekê wê zêdeyîyake "Riya Teze" çap bûbûya.

Lazim e rojname her wext anotasiya û rêsênziyayên (rexnên) kitêbên Kurdî neşîr ke. Vederê gotî culet bin.

Niha pirs "Ezîdîtiyê", "Surmaniyê" buye kula piçengê. Ezê tenê ser gotina hevala da tiştêkî zêdekim.

Di rojnamê da derdik-evin, gelekî xirab in. Rojname betreng e, rind nayê xemilandinê.

Niha pirs "Ezîdîtiyê", "Surmaniyê" buye kula piçengê. Ezê tenê ser gotina hevala da tiştêkî zêdekim. Rojname derheqa xebatkarên Kurdên Musulman da jî vir û wê da divê gelekî binvîse.

Wezirê Eşo (Nivîskar):

Ez zû va ye ji rojnamê ra dinivîsim. Xwestina min a pêşîn ew e, wekî serwerên parên redaksiyonê qêdrê miqaledara bigrin, zû caba me bidin, tevî me rind bixebitin.

Rojname gerekê derheqê decaliyên Stalinîzmê da hindava cim'eta me da binvîse.

Zimanê cim'eta meyî literatûriyê hewcê nazîkîrinê ye. Lazim e rojnama "Riya Teze" guhdariya xwe bide ser pîrseke ûsa ya ferz, wek pîrsa xalîbûna we'dê nihaye, pîrsa "xopançiya" ye.

Bi texmîna min, we'de ye navê rojnamê bê guhastinê. Ev nav ne bi dilê xwendevana ye. Rojname çiqas hewaskar be, ewqas tîraja wê, wê zêde be.

Hetanî niha rojname li ser wê xebîrname Kurdîya rastnivîsandinê him dibe, ku Eminê Ewdal ew hazir kiriye. Lê rastnivîsandinê bi curê Çerkez Bakaev kêmtê xebtandinê.

Şakroyê Xudo (Doktorê ulmê dîrokê, profesor):

Ew lawikên xebirdan, tê bêjî ku "ji min birin". Lê gelek tişt hate wekilandinê. Dêmek, fikra wan yek e.

Hevala rast gotin, pîrsa xebir-termina lazim e bi hûrgilî bê lînehêrandinê. Gelek xeber hene, ku hatine "çêkirinê" û eva 30 sal e cim'etê qebûl nekîrine.

Rojname dikare çi bike û çî ji destê wê nayê? Gelek cara ûsa qewimîye, ku redaksiyonê jî bo ku miqalên ser jî stuyê xwe bavêje, gunekiriye stukura organên jordest.

Pîrsa nitirandin, xemlandina rojnamê (aliyê şîkil, şîrifî û mîzanpaj) pîrseke gelekî ferz e. Vê dercê da nava xebata rojnamê da kêmasiyên mezin hene.

Pîrsa bijartina dîtinan: Redaksiyon gerekê bighîje wê yekê, ku bi qeweta nivîskarên xwe dîtinên resmî bide bêjîngîrinê. Redaksiyon dikare derheqê hal-wextê Kurdistanê, şervaniya cim'eta me ye miletiyê-azadariyê, pêşênî û rêxistinên miletiyê da dîtinên pêşekzanên cihê çap ke.

Derheqê nivîskarên Kurd ên klasîk û dema niha de rûpelên rojnamê da kêmtî qinyat çap dibin. Ev kêmasî gerekê zû bitê hildanê.

Lazim e ûsa jî kronîka hinek neşîrkirinên Kurdî yê li welatên dereke bê dayîne.

Kinyazê Îbrahîm (Doktorê ulmên filolojiyê):

Rojnama "Riya Teze" xebateke mezin dike, lê şaşî û kêmasiyên wê jî kêmtî nin. Civîna îro mecalê baş e bona hildana wan kêmasiya.

Tiştêkî weşartinê nîne, wekî îro dûtûretî bêtifaqî ketiye orta cim'eta me. Di vê pîrsê da, fikra min, gunekariya rojnamê û redaksiyona xebirdanê radiyoyêya Kurdî jî heye. Wan di wextê da pêşîya vê yekê negirtin, merivên di vê pîrsê da gunekar rûreş û belû nekîrin.

Pîrseke mayîn, rastî ye jî, gelek qinyatên rojnamê kevn dibin, na-êne xwendinê, îllahî ên resmî. Ez jî li ser wê fikrê me ku rojname heftê sê cara derê.

Ferîkê Üsiv (Şair)

Ez dixwazim çend xebir-termin bîne guhastinê. Bi texmîna min, divê terminên ortemiletîye neyên tercimekirinê: Çawa hene ûsa jî bidne xebatê.

Pîrsa marîfeta nivîsarê pîrseke lape mezin e. Gelek cara nava neşîrkirinên rojnamê da xebirên qûbe kêmtî nabin, hertîm "emrê me şa û bextewar e"...

Di rûpelên rojnamê da efrandinên min kêmtî çap dibin. Hetanî niha derheqa efrandinên min da miqalak literatûrzanîyê tam çap nebûye. Em gerekê jî kîrtîka objektîv venekîşin.

Di pîrsa zimên da divê em hîn gelek tiştî ji cim'etê hîn bibin. Zimanê meyî literatûriyê gerekê ji xebirdana cim'etê ya sade dest pê bike.

Celîle Celîl (Kandîdatê ulmên dîrokê):

Ew hemû tişt, ku di nava emrê cim'eta me ya kulturîyê da diqewimin, lazim e di rojnamê da bîne kivşê. Ji umrê mektebê me yê gundan, dîtin kêmtî tîne çapîrinê. Divê temamiyên problematîk bîne bilindîkirinê.

Derheqê umrê xwendekara da qinyat hindîk çap dibin. Baş dibe li rex rojnamê "para xwendekara" bê sazîkirinê.

Van axirîya rojname ji umrê Kurdên cumhûriyeten biratiyê kêmtî qinyata neşîr dike. Çiye

me'nî? Me'nîk tenê heye: Pevgirêdana baş tune.

Tiştêkî xirab e, wekî hetanî niha kartxana (kartoteka) rojnamê, mesele ya şîkla, melumetiye derheqê miqaledara da tune. Eva yeka operatîvîya rojnamê jî dide sistîkirinê.

Propropandakirina emrîyîna me wek di rûpelên gazetê da, ûsa jî di radiyoyê da gelekî sist û betreng (bi rengêkî xerab) tê kirinê.

Şîraliyê Ahmed (Dersdar):

Eger hûn xebatîyên xwe bişînine gunda wê çaxê hûnê diha rind pê bihesin ku cim'et jî xebata rojnamê çiqasî bi gazin e. Mekebê me di halekî xirab da ne, kitêbên dîrsa bersîvê nadin xwestinên vê demê, gund xalî û xirab dibin, di wan da mecalê sosyal-kultûriyê yê lazim kêmtî in.

Tosinê Resît (Kandîdatê ulmên kîmyayê):

Ez dixwazim ku, rojname van rubîkan tim bide xebitandin: "ji dîroka Kurdistanê", "ji dîroka cim'eta me".

Pîrsa dîda derheqê paqîjbûn, nazîkbûna zimên da ye. Em nikarin jî xwe ra zîmanekî Kurdên Yekîtiya Sovyetîyê cihê çêkin. Zîmanê Kurdî yek e. Seba dewlemendîkirina zimên lazim e ji zaravê Soranî hîn gelek terîma hildin. Zîmanê Kurdî bi zaravên xwe va gelekî dewlemend e.

Hesenê Üso (Xebatkarê turîzma hundîrî):

Cim'eta me hêdî-hêdî dest hev diçe: erf-edet, rabûnrûniştîna xwe bîr dike. Lazim e ev yek ji guhdariya rojnamê der nemîne.

Pîrsa termin-xeberên xerîb da rojnama "Riya Teze" gerekê ûsa jî ceribandina rojname û kovarên Kurdî yê welatên dereke bide xebatê.

Divê em qêdrê hev bigrin. Lê hin serwerên para, bi meha bersîva miqaledana nadin.

Ezîzê Gerdenzerî (Kandîdatê ulmên doktorîyê):

Rojname hîn negihîştîyê wê yekê, ku wek lazim e miqaledarên mexlûqetîyê bi xwe ra bide girêdanê, hewaskariya wan bide bilindîkirinê.

Bi rastî di şîklên rojnamên der-tên da emrê cim'eta me pak nişan nadin.

Me zarê xwe jî bîr kiriye. Di derheqê wan da di rûpelên gazetê da em kêmtî tiştan dixwînin.

Eskerê Boyîk (Kandîdatê ulmên ekonomîkîyê):

Li vir em tenê di derheqê rojname da xeber didin, lê kêmasiyên xwe jî bîr dikin. Lê hetanî niha me çî kiriye? Em vê yekê vedîşêrin kîjanî me hetanî niha lîkolînek, nivîseke aniye, ku rojnamê çap nekiriye? Dibêjin "Dew xwestin, kodîk weşartin?" yanê cureta me ya nivîsarê tune. Gelek şayîr û nivîskarên me hene, ku efrandinên wan sist in.

Kêmasiyên rojnamê jî hilbet ne kêmtî in. Vêderê di derheqê wê yekê da gelek tişt hate gotinê.

Gundê me xalî dibin. Lê em derheqê vê yekê da nanivîsin.

Elîxanê Memê (Şair):

Salê 104 hejmarên rojnamê der-tên. Eger her pênc parên redaksiyonê her yek qene mehe carekê problemekê diyar bike.

Em di derheqê rewş û xemla rojname da xeber didin. Lê çî dikeve nava wê da? Berê ewlîn şîklî "xwendinê", semivîsar, çap û curê mîzanpaj tîne ber çavan.

Ezîzê Cewo (Kurdzan):

Bona ku gelek tişt nayê gotin, lema jî min xeber da. Min nikaribû xwe kerr bikira. Berî her tiştî deriyê "Riya Teze" jî teva re timî nevekiribûye.

Gelek miqale bi mehan di redaksiyonê da diman, hin qewmandinanan ew hatine çapîkirinê.

Di orta rojnamê û xwendevanan da diwarê psîkolojiyê pêş da hatiye.

Gerek e redaksiyon bighîje wê yekê, ku bi destê bilindîkirina hewaskariya rojnamê xwendevan bi hizîkirin jî xwe ber ji rojnamê re binvîsin...

Kûtasiyê, redaktorê rojnamê Tîtalê Efo xebata civîne tomarî kir, bi navê kolektîvê razîbûna xwe da haziran.

Roportaj

Büyer: Qetilkirina 33 gundiye feqir bi gullebarankirine

Ci: Wilayeta Wanê, nehiya Ozalpê, gundê Qoçqirina Jorin, Çemê Sefo. sinorê Tirkîyê û Îranê, hudûdê kevirê 56 numreyî.

Tarix: 23'ê Tirmeha 1943'an berdestê sibê.

Sûcê îsnadbûyî: Casûsî

Sebebê girtinabinçav: Dizî

Biryara mehkema eskerî: 33'ê bêsûc in.

Esasê meselê: Orgeneral Mustefa Muglali Paşa:

"Meşandina büyerên di derheqê Kurdistan de, di nav pîvanên normal û li gor telakiya dewletê ne mumkun e"

Kirîbo halê min eynî wiha binivîse

Dibe ku rîwayet bête zanîn

Memikên gulîn nînin

Gulla domdomê ye

Perçe-perçe di devê min de

Ahmed Arif

Ji gundên Xirabasorik, Rûnexwar, Mîlanengîz, Xeretel, ji eşira Milan 33 kes di vî cemî de destên wan li paş pişt wan girêdayî, bi çongan ve xistin erdê û gullebaran kirin. Di nav wan de, merivên hewqas kal ku nikaribûn bimeşin, xortên ku nuh ji eskeriyê hatibûn û zarokên ku qet haya wan ji tu tiştî tunebû, hebûn. Kesên bi dergistî, yê nuh zewicî he-bûn. Dengê fişekan dua nîfir û qirînen wan fetisand. Perdak sîr û yasaxê kişandin ser. Piştî şeş salan vebû. Di mahkemê de hesab hat pîrsîn. Sûcdar mahkûm bûn. Büyer ji vî alî ve dikaribû qediyayî bihata hesabandin. Lê belê tiştê ku min eleqeder dike ne mahkûmiyeta însana ye, mahkûmiyeta dîtinên wan e. Çi heyf ku ev, hîn bi rast negeriyaye. Ez dixwazim a ev yek, bi rast bigere.

Gundê wêran

Gunay Aslan

Wergêr: Z. Xamo

Ez li wî gundê Xirabasorik ê Ozalpê me ku ji 33 kesan 25'ê wan jê hatibûn birin. Gund, hema li sinorê Îranê ye. Li perê çiyakî ava bûye. Aliyekî çiyê Îran, aliyekî çiyê Tirkîyê ye. Wek ku ji cîranekî here cîranekî meriv dikare here Îranê û ji Îranê jî cardin bi vî hawî dikare vegere. Zawahîriya gund bi navê xwe re paralel e: Xerabe.

Ez ji Latîfe Çelebî ya ku mêrê xwe yê panzde rojî Sicoyê Çelebî û xezûrê xwe Acoyê Çelebî ku di Çemê Sefo de wenda kiribû bi zahmetî dipirsim: Di nozde saliya xwe de ew talî û dijiwariyên ku ditiye bi wê kesera ku carek din wan tev rake, ez dixwazim ku ji min re qal bike. Bûka wan rojan, pîra rojên îro Latîfe dibêje:

"Çaxa ez bûm bûk mêrê min esker bû. Min salekê ew pa. Rojê derket hat. Gotin mêrê te ev e. Em karibûn panzde rojan bi hev re bimana. Şeva roja panzde gotin ku cendimman dora gund girtine, wê gelek kesî bibin. Em ditirsiyan, me deriyên xwe girtibûn. Di navê re me ji malên cîran qîrîn, girî dibhîst. Dor nêzikî me bûbû. Deriyê me lêket. Peyê min vekir. Navê tiyê min û peyê min xwendin. Xezûrê min jî derket. Min zanibû wan dibin mirinê. Feqet bêyî girî û lorandinê tişteki din ji destê me nehat. Ez qiriyame, min kiriye hawar, girya me,

min ruyê xwe perçe kiriye, bi halekî nivxewirî di çiyê xwe de ketime. Çuqas wext derbas bûye nizanîm. Çaxa min çavên xwe vekir, xwesiya min li ber serê min him dike û dilorîne û him jî eniya min şil dike. Piştî çend rojan me xebera mirina wan girt. Ez di wan rojan de pîr li Xwedê geriyam. Li erdê, li ezmên, di şevên tarî de, tune, tune. Ji qûl ji xwe hevîya me tunebû". "Dayika Latîfe" hîn pîr tiştî dibêje. Doşega ji hiriyê ku ez li ser rûdinim min nerehet dike. Ez radibim. Dayika Latîfe bêdeng, bêdeng digrî. Ez di hundur odê de diherim û tîm...

"Latîfa Bûkîn" bi salan bi pişt re li birê Sico, li Alîxanê sêzde salî mar kirine. A nuha 6 zarok û bîst û yek neviyên wê hene. Li gel hemû îsrarên dayika Latîfe ez wê şevê nikarim bimînim. Radihêlim çentê xwe û bi rê dikevîm.

Bi tariya êvarê re ez dighîjim Mîlanengîz ku 17 kîlometra ji Xirabasorik wê de ye. Kûçik tîm min. Li ser dengê kûçikan gundiyeke tî, ez mala pîra Cazê jê dipirsim. Pîra Cazê diya Îbrahîm Ozturk e, ku Îbrahîm ji qetlîamê birîndar xelas bûye û derbasî Îranê bûye. Pîra Cazê di xaniyê tenûrê de min dike mîvan. Em di xaniyê tenûrê de, ku çira pitpitokî bi zor ronî dikir, diwar û maxên wî ji teniyê wek qîranê reş bûbûn sohbe-

tê dikin. Berê ez vedikim. Guhdarî dike. Bi baldarî wek ku bedena wê ya hişk, bêruh, ji nuh ve ruh pê de were dilerize û guhdarî dike. Ez dibêjim, piştî ku min qedand, tu dest pê bike. Ez xwê bi birîna wê werdikim. Carê keserekê dikşîne û dest pê dike:

"Bi gullebarandina pêşî re lawê min Îbrahîm birîndar dibe û dikeve. Yê din giş bi ser wî de dikevin. Dibên qey miriye, dihêlin. Lawê min di nav miriyên me de bi seetan dimîne. Gava dibe şev hêdî hêdî hêzî ser xwe dike. Wî bi xwe digot: Wê şevê li ezman sitêrkê tenê hebûye. Û ji wê sitêrkê ronahî niqutiye. Ne ronahî, wek ku sitêrk bigrî. Ronahiyê rê nîşanî wî daye. Sînor derbas kiriye, xwe avêtîye Îranê. Li wir, li ba merivên xwe bi cî bûye.

Em lêwîk mirî dizanin. Şîna wî dikin. Çel rojiya wî tamam dibe û em mewlûdê didin xwendin. Di nabênê re salek derbas dibe. Ji Îranê merivên me tîm mîvaniya me. Mizgîniya lawê min anîne. Hema êvara roja din bi malî em derbasî Îranê bûn. Min lawê xwe wisa himêz kir ku qet qal meke. Kêfek wisa ku ez dixwazim her kes wê bijî. Ez giriyam, pîr giriyam. Ne wek ku lawê min nuh hatibe dinê, wek ku nuh miribe ez giriyam. Ji ber ku lawê min bûbû ta û derzî. Ew Îbrahîm çûbû, Îbrahîmekî din hatibû şûnê.

Di demek kin de me rewşa rastî fahm kir. Bi şevan diqirîya û şiyar dibû, bi cî bê cî digirîya, carna jî bêdeng dibû, wer xwe wenda dikir. Hîs pê ra nema bû, bûbû wek kevirêkî û çûbû.

Lawê min êdî bûbû miriyekî bes hilm digirt û berdida, digirîya, didît û dipeyivî. Dilê wî zêde deyx nekir. Piştî sê salan bi rastî jî mir..."

Piştî ku gotinên xwe diqedîne bala xwe didimê; ji kortikên çavên Pîra Cazê yê hişkbiyî hêsir dibarin. Ez bi xwe de dixeyidim.

Ez mîvanê Pîra Cazê me, bi şev dereng wexta ketim nav nivînan dikim nakim xew nakeve çavê min. Di şevê de hîskîniyên Îbrahîm hene. Tu dibê qey pêjna wî girtiye ser çîyan, ser keviran.

Ez li gundê Xiretelê me ku çendî car jî qetlîaman re bûye sahne. Ez bi Nevbaharê; neviyê Ahmed Tûnc re dipeyîm, ku ew yekê ji 33 kesan bû. Nevbahar keçikeke 12 salî ye. Dizane ku kalikê wê miriye, lê çî heyf ku nizane gorra wî li ku ye. Pîrika wê Nazdarê jê re gotiya "gorra kalikê te li ezmana ye". Ku kî jê dipirse, Nevbahar ezmana nîşan dide, dibêje; "Kalikê min li wir e".

"Bi şev, çî wexta ku deriyê min lêkevê destê min dihere silehê. Ezê li sileha xwe bigerim. Wisa dibêje Kemal Ata bavê Ahmet Atayê ku di nav 33'an de e herî xort bû. Di şevêk tarî de cendirman girtine ser mala wî û lawê wî girtine birine. Cenazê wî jî nedîtîye. Ji ber vê yekê bi şevan pîr nerehet e. Tîm bi şik, bi tîrs e. Di van demên nêzik de, neviyê wî Mahmûd, ku bi kincên eskeriyê hatibûye îznê, gava danê êvarêkê di derî de dibîne, dest davêje silahê, gullan lê dibarîne. Mahmûdê ku bi zor ruhê xwe xelas dike, karê wî yê pêşî dihere kincên sivil li xwe dike. Mahmûd, hema hema tu namîne ku rûhê

xwe bide ser çewtiya xwe. Tiştên ku bavê Ahmed Ata qal dike îman tune ye ku em wan binivîsin.

Rûnexar ji gundên Ozalpê yê herî xweşik e. Belkî jî di xweşkiyê de yê teka ne ye. Bi taqiyên ji bûkikan(xilînzêr), bi bestên zelal zelal diherikin li vir tabietê bûkaniyê kesek a ji reng û mangan xemilandî berra ser bejna xwe dide...

Mêmemê Ozay dibêje "Me ji derd û kulan xweşikayî ferq nekirin". Mêmemê Ozay, lawê Sultan Ozay e, dema ku sultan hat gullebarankirin 81 salî bû û di nav 33'an de yê herî bi umir bûye. Sultan Ozay, yek ji malmezînen wê demê bûye. Li gor gotina lawê wî "ji mirîşka kesî re negotiye kiş û ji kûçikê kesî re negotiye oşt". Memê Ozay 72 salî ye. Dibêje nîgekî min li vî dinê ye û nîgekî min jî li vî dinê ye û dî re didomîne: "Ezê çavvekirî bimrim. Bavê min bi gur û teyran dan xwarin. Bi çavên xwe yê dinyewî ez dixwazim çemê Sefo bibînim". Mala Ozayan di sala 1957'an de erzûhalek (daxwazname) dane Serokatîya Meclîsa Tirkîyê. Di erzûhalê de daxwaz kirine ku Çemê Sefo ji bo ziyareta umûmî vebê. Lê li gel ku di ser vî erzûhalê re 32 sal derbas bûne hîn jî bersiv nehatiye dayîn.

Manga Îdamê

Ez li destên ku tetik kişandine digirim. Hinek mirine, hinek xwe vedîşêrin, hinek jî napeyivin. Ez bi Îsmail Çolak re bi wî şertê ku ez çiyê wî yê nuha ku ew lê dimîne diyar nekim, dipeyivim. Çolak, di sala 1921'ê de li Nîgdê, li Aksarayê hatiye dinê. Eskerîya xwe li Wanê li Tumena 10'an di Yekîtiya Suwarî de wek yekemîn cepxaneciye makîneliya sivil temam kiriye. Yekî ku di qetlîama "33'an" û ya Xretelê de tetik kişandiye. Ez peyvê didim wî:

"Muglali Paşa bi şexsê xwe hat Wanê û bi emrê wî, Yekîtiya Suwariya neqlî nehya Wanê, Sarayê bû. Ez di sivilîya xwe de jokey bûm. Ji ber vê yekê ji Yekîtiya Suwariyan re hatim hilbijartin. Şeva bûyerê, wek hertim em li îkametgeha xwe ya nehyê li camiyê raketî bûn, bi nuucandina çawîşê min ez bi xwe hesiyam. Ji min re got, "Rabe xwe tev bike û bêyî bikî tepe-rep derekve der, qumandar dipê". Gava ez derketim der, min Mulazim (tegmen) Necdet Bîlgez li gel 15-20 erên ji bolika me dît. Bîlgez ji Adapazariyê bû. Pîr derbas nebû em bûbûn 30 kes. Mulazim ji mer got, "Bira her kes hespa xwe hazir bike û xwarina xwe ya şeş rojan bigre ba xwe, emê girtiyan bibin Mahkema Îdara Urî ya Erzeromê. Her der tarî bû. Tavilê me xwe hazir kir.

Dema em gihîştin tabûrê me gundiyeşîr ku derxistibûn der, di payinê dît. Bê payin em ketin rê. Em suyarî, gundî peyatî dimeşin. Îhtûmala ku ewê gullebaran bibin qet nedihat bira me kesî.

Me gundê Guzeldere derbas kir. Di nav wan de kesên wisa kal hebûn ku nikaribûn bimeşiyana. Kesên ku nikaribûn bimeşiyana, bi dor li pişt xwe dikirin. Em hatin nêzikî gundê Qoçqiranê ku

êdî destê sibê bû. Dinya tarî bû. Zabit (Ustegmen) Bîlal Balî mola xwarinê da. Balî, ji Îzmîrê bû. Me kumanya xwe derxist û xurîniya xwe kir. Li ba gundiyan şeker û nan hebû. Ji kaniyê av anîn û ji xwe re şerbet çêkirin. Nanên xwe di şerbetê de dikirin û dixwarin.

Dudu jî esker hebûn, navên wan Sico Çelebî û Şukrî Kûrûnca bû. Ji vana yekî, ez bawer dikim Şukrî bû. Ji bo ku li ber kaniyê xwe bişo, hat ji mulazim destûr xwest. Mulazim pîr hêrs bû. Çend qamçî lê xist. Mêrik bêçare hustuxwar çû li çiyê xwe rûnişt. Emrê rabûnê hat dayîn. Dîsa em ketin rê. Hîn em 100 mîtroiyê neçûbûn, di rexê xaçiriya Çemê Sefo de me kindirên ku danibûn wir dît. Li wir emrê ji hespa "peya bin" hat dayin. Mulazim wexta ku got "girêdin" me fahm kir ku emê van mirovan bikujin. Mecbûr me ew girê dan. Me ew kirin du grûp, destên wan ji pare û ji bin çengên wan, ew bi hev ve girê dan. Me grûba yekê di bin qumandariya Zabit Bîlal Balî, grûba dudiya jî di bin qumandariya Mulazim Necdat Bîlgez de daxist çem.

Di vî nabênê de min nerehetiyek derbas kir û min ji çawîşê xwe re got ku ezê nikaribim derkevim înfazê, min got ku min wek cigîr bihêle. Çawîşê min qebûl kir. Ez wek cigîr (yedek) li ba hespa mam. Hevalê min Bahattîn Satilmîşê Hesênçelebî di dêlî min ve çû înfazê, ji 30 eran bîstên wan ji Erzeromê ji Hesênçelebî bûn. Ez li ba hespan dipê. Di vî nabênê de Zabit Bîlal Balî dibêje, "ka cepxaneciye makîna sivil li ku ye?". Çawîşê min dibêje ku nexweş e û ew wek cigîr ma ye. Zabit diqehere, Bahattînê ku di dêlî min ve çûbû jî pê re, hat. Çend qamçî li min xist. Me hespên xwe ji cigîr re hîştin û em bi Zabit re daketin çem. Gişên wan bi çongan ve xistibûn erdê. Her du grûp jî bi çarpiyan hatibûn ba hev. Pîrê wan bi dengêkî bilind dua dikirin. Yê diqirîyan, ban dikirin û xeber didan hebûn.

Bi emrê atêşê re min çavê xwe girt. Bi hawakî bêşuûr min tetik kişandiye. Fişekên min qediyane, ez hîn di halê atêşê de me. Bi pihînen ku min ji zabit xwar li ser piştê ketim. Ji min re got van mirovana yek bi yek veke. Min giş vekirin. Min bala xwe dayê ku yek hîn sax e. Çavên me ketin hev. Ez ketim halekî wiha ku qet nikarim binim zimên. Baş e ku sileha min ji min hatibû girtin. Di dêlî wî merivî ve min got ku qey ez dimrim. Min dikaribû li xwe xista. Yanî ne îşê tehamulê ye. Min karê vekirîne qedand. Di vî nabênê de bi piyadan kemîn dihat kolandin. Me gişên wan, yek bi yek di derên kolayî de bi cî kirin. Yê birîndar min li pişt xwe kir û bir. Ku yekî din bizanibe wê muheqqeq bi kuje. Dawiyê ev meriv xelas bû. Reviya çû Îranê. Me jî marşa 'Ser, Çiyê bi Dûxan e' digot û vegeiryan Sarayê. Bi her kesî re ruhê merivekî wek ku wezîfeyek milî bi cî anibe hebû..."

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

◆ Li gor agahdariyên ku hatine îspat kirin, jineke Rûsî ku bi Fjodar Vasilev re zewicî bûye, 69 zarok aniye dinê. Wê 16 car cewî, 7 caran sê zarok bi hev re, û 4 car jî çar zarok bi hev re aninê dinê. Ji van zarokan 67 zarok di navbera salên 1725-65'an de jiyane.

iro xwediyê rekora zarokçêkirinê di destê Leontina Albina (di sala 1925'an de li bajarê Espinoza li Şiliyê hatiyê dinê) ye. Wê cara pêşin di sala 1981'an de zarok aniye dinê û hejmara zarokan bûye 55. Ji van zarokan tenê 40 (24 lawik û 16 keçik) zarok iro di heyatê de ne.

◆ Win Klein ji Hollandayê ye, di 7'ê Nisana 1981'an de, di hesabkirinê de gihîştê rekorek din. Win Klein di deqîqek û 28,8 saniyan de hesabê koka 13'ê min a hejmara bi sed reqemî kir.

◆ Shakuntala Devi, ji Hindistanê ye,

di hezîrana 1980'an de hesabê 7686369774870 x 2465099745779 = 18947668177995426462773730 di 28 saniyan de çêkir. Di hesabê wê de tu şaşîti tunebû.

◆ Di salekê de nêzî 500.000 car hejandinên seismîk an jî makroseismîk tînen qeyd kirin. Ji van erdhêjandinan nêzî 100.000 bîyî alîkariya materyalên teknîkî tînen tespîtkirin û nêzî 1000 zelzele zirarê dide me. Zelzeleya herî mezin di 22'yê Gulana 1960'an de li Şiliyê bû. Zelzeleya ku zirara herî mezin da, di 27'ê Tîrmeha 1976'an de li Çînê çê bû. Nêzî 750 000 însan mirin. Heya sala 1982'an jî ziyaretkirina herêma ku zelzele li qewimî bû, qedexe bû.

◆ Tercumanê Neteweyên Yekbûyî George Henri Schmidt ji alî zîmanzanî ve mirovekî harîka ye. Ew 31 zîman wek zîmanê xwe yê zîkmakî dizane û dikare ji 66 zîmanan wergerîne.

Li dinê zîmanzanên din ev in; Kardinal Mezzofanti (1787-1832). 27 zîman zanibû, Rasmus Rask (Danîmarkî 1787-1832), Johna Bowring (1792-1872) û Dr. Horald Williams (1876-1928) ji Zelandaya Nû 28 zîman zanibûn.

Konferansa Navnetewî ya Parîsê

Di 14 û 15'ê Çirya Pêşin de li Parîsê ji alî Weqfa Azadî a Fransa û Enstîtuya Kurd a Parîsê bi navê "Kurd; mafên însanî û huviyeta çandî" konferansê navnetewî çêbû. Di konferansê de ji 26 welatan parlamenter, alim, siyasetvan, Kurdolog, rojnamevan û nivîskar beşdar bûn. Berpirsiyarên partî, rêxistin û gurûbên Kurdan wek şexs di konferansê de hazir bûn. Şexsiyeten bi nav û deng wek E. Kenedî û Willi Brand bi namên xwe piştgiyariya konferansê kirin. Cara yekem ji Yekîtiya Sovyet, Amerîka û hin dewletên Ewropayê di vê konferansê de hatin cem hev û dîtînen xwe li ser pîrsa Kurdî anîn zimên. Di dawiya Konferansê de li ser rewşa Kurdan hinek biryarên girîng hatin stendin.

Konferans di bin himaya Seroka Waqfa Azadî a Fransê Danielle Mitterrand de çê bû. Wê di axaftina xwe de got ku: "ez bextiyar im ku ev konferansê hat amedekirin. Di parastina kulturî û huviyeta xwe da, em bi salan e bi dostên xwe yê Kurdan re ne. Iro wê mafê însanî û huviyeta kulturî ya xelkekî 25 milyon bê munaqesekirin."

Di Konferansê de 40 kes axaftin û hemû jî dirêj li ser rewşa Kurd û Kurdistanê sekinîn. Ji Yekîtiya Sovyet M. S. Lazarev di axaftina xwe de got ku; di van 60-70 salên dawiyê de pêşketinek mezin di pîrsa Kurdî de çêbû. Ji bo Kurdan Sevr hêvî bû, Lozan îflas, li Parîsê dîsa hêvî nuh dibe û bi mesela mafê însanî û kulturî pewîst e meriv dest bi xebata mafê çarenûsî bike." Senatorê Amerîkî Peter Galbraith, li ser mesela bikaranîna çekên kîmyayî li Kurdistanê Iraqê axift. Wî di axaftina xwe de wiha got: "Bikaranîna çekên kîmyayî li hember Kurdan perçeke ji siyaseta eskerî ya Iraqê bû. Iraq bi vî hawayî ancax karibû nufûsa Kurdistanê Iraqê ji holê rake û gundan îmha bike û heta piştî bikaranîna çekên kîmyayî kesên ku sax mabûn ji alî eskerên Iraqê ve hatin gulebaran kirin û cesedên wan jî bi bûldo-

zeran hatin pelçiqandin." Parlamenterê Kurd ê Meleyê İbrahîm Aksoy jî di konferansê de li ser "rewşa Kurdên Tirkîyê" axaftinek hêja kir. I. Aksoy di axaftina xwe de bi faktan li ser rewşa aktuel a Kurdistanê sekinî û got: "Pîrsa Kurdan ne doza îhlalkirina mafê mirovî ye, ev doza, doza xelkekî 25 milyona ye ku erdên wan bi qasî erdê Fransayê û bi salan e ku di bin zulmek hov de ne û hebûna wan jî di bin tehdîtê de ye."

Thomas Hammerberg (ku yek ji berpirsiyarê komîta mafê Kurdan a Swêd e), di axaftina xwe de wiha got; "Mesela Kurdan meselake wisa ye ku gelek dewleta aleqedar dike. Mesela petrolê heye ku welatên OPEC xurt in û ew jî tesîr li ser Ewropayê dikin û ji alî din ve jî rêxistinên Kurd rast yan jî çewt bi daxwazên azamî li mesela xwe nihêrin, bi carekê de serxwebûn xwestin ew jî hin dewlet û welatan ditirsîne."

Kesên ku di konferansê de axaftin;

Di bin seroktiya Lord Averby (serokê komîta mafê mirovî ya parlamen-toya İngilistanê) de;

Maksim Rodinson "Di îslamê de netewe û eqelîyet"

Kendal Nezan "Diroka Kurdan"

Dr. Joyce de Wagnen "Zîman û edebiyeta Kurdî"

Nivîsa Dr. Martin Wan Bruinessen "Civata tradîsyona Kurdan û dewlet"

Di bin serokatiya Daniella Mitterrand (seroka Weqfa Azadî a Fransa) de;

İbrahîm Aksoy "Li Tirkîyê rewşa Kurdan"

Helena Qasimlo "Li îranê rewşa Kurdan"

Dr. İsmet Şerif Wanli "Kurdên Sûriyê û Lubnanê"

Prof. Nadir Nadirov "Kurdên Yekîtiya Sovyet"

Awuqat Mehmet Ali Aslan "rewşa multeciyan Kurdan li Tirkîyê û îranê"

Mohamed Reşîd "Li ser navê multeciyan Kurdan ku li Fransayê ne"

Di bin seroktiya Dr. Bernard Kouchner (sekreterê dewletê û berpirsiyarê Mafê însanî yê Fransa) de;

Patrich Baudoin (Sekreterê Giştî yê Mafê însanî yê Navnetewî)

Raphaël Doueb (Sekreterê Weqfa Azadî a Fransa)

William Eagleton (Sefîrê kevn yê Amerîka yê Baxdad û Şamê)

Peter Galbraith (endamê komîta karûbarê derva ya Senatoya Amerîka)

Jerry Laber (Direktora gurûba çavdarî ya Helsînkî ya Amerîka)

Gwynne Roberts (Rojnamevanê İngilîz)

Dr. Florance Veber (Medico International)

Dr. Bernard Grandjon (doktorê Fransî)

Selîm Fahrî (demokratê Iraqê)

Dr. Hebib Bulus (Yekîtiya Nivîskarên Ereban)

Huseyin Ait Ahmed (wezîrê kevn ê Cezayîr)

Kerîm Lahici (Serokê Yekîtiya Awuqatên îranê)

Hesên Şerîfî

Server Tanillî (Di Universîta Strasbûrgê de Profesor)

Kemal Burkay (awuqat)

Doğu Perinçek (rojnamevanê Tirk)

Alî Akbaba

Di bin seroktiya Raphaël Doueb (Sekreterê Waqfa Azadî a Fransa) de;

Prof. Rene Jean Dupuy (Fransa)

Pell Claiborne (Serokê karûbarê derva yê Senatoya Amerîkî)

M. S. Lazarev (Di Enstîtuya Moskova di beşa Rojhilat de alim)

Thomas Hammerberg (Serokê kevn yê Amnesty International û serokê Rêxistina Parastina Zarokan a Swêdê)

Elena Boner (xanîma Prof. Andrei Saharov)

Hindik-Rindik

Kurdistana Şor

Piştî 12'ê Îlonê hêzeke Kurd bi navê "Tevgera Şoreşgerên Kurdistan" li dijî cûntayê belavokê belav kiribû. Belavok li Diyarbekir ketibû destê polis. Cara pêşî bû ku polis navê "Tevgera Şoreşgerên Kurdistan" dibihîst û nizanibûn bi Tirkî mana wê çiyê. Ban bekiyekî Kurd kirin, gotin "vêya ji me re tercume bike".

Bekçî jî di jiyana xwe de cara ne nivîsa bi Kurdî dibû û ne jî gotina "Tevgera Şoreşger" bihîstibû. Bekçî piştî ku kûr û hûr difikirî, dibêje "hebe nebe wê mana 'şoreş'ê 'şor' be û mana 'Tevgerê' jî 'here were be'. Li gor vê tahlîlê "Tevgera Şoreşgerên Kurdistan" bi Tirkî dibê; "Git gel tuzlu Kurdistan". Yanî, "Here were Kurdistanana Şor".

Piştî vê tercumê, polis ji grûba "Here were Kurdistanana Şor" re jî dosyakê vedike.

Dara Xurmê

Harûn Reşîd ji rojan rojê Remezanê bi wezîrê xwe Cafer re li rex çemê Dielê ji xwe re digeriya. Harûn Reşîd bala xwe dayê ku waye yekî kal dareke xurmê datîne. Meraq kir çû bal:

"Kalê delal, dara xurmê di çel salan de ber dide, tu ji kal î, hema te çand, tu yê çî bikî jê".

Kalo got:

"Ya Sultanê min, yê berî me hatine, ji me re danîne, ez jî vê ji yê ku wê di pê me re bîn re datinim".

Kêfa Harûn Reşîd gelekî jî vê bersîva kalo re hat û rabû kîsek zêr dayê. Li ser vê, kalo bi çonga ve kete erdê, her du destê xwe ber bi jor ve vekir û ji Xwedayê xwe re şukur kir. Vê yekê jî bala Harûn Reşîd kişand û ji Kalo sebebê dua wî pirsî.

Kalo got: "Herkes dara ku datîne di çel salan de xurmên wê digre, lê belê ez tavilê digrim, ji bo wê min jî Xwedayê xwe re hemd û sena kir".

Harûn Reşîd, li ser vê bersîva Kalo wexta ku rabû kîsek zêrê din dayê, wezîr jê re got:

"Ya Sultanê min, heta ku ev serwet li ba te û ev zîmanê şîrîn jî yê vî kalî be, wer xuya ye ku wê hemû xezîna te ji dest te bigre".

Amadekar: Zînarê Xamo

Biryara Dawî ya Konferansê

Konferansa ku ji alî Weqfa Azadî a Fransê û Enstîtuya Kurd ku li Parîsê di navbera 14 û 15'ê Çirya Pêşin de hat civandin: Konferansa Navnetewî; Kurd, Mafên însanî û huviyeta netewî diyar ku:

-Kurdên ku di nav çend welatan de perçe bûne, li her welatê ku lê dijîn ji bo ku huviyeta xwe ya netewî biparêzin, ji bo ku mafên xwe yê meşrû yê siyasî û demokratîk biparêzin rewşeke trajîk dijîn. Konferans, vê rewşê digre diqetê û van nuxteyên jêrîn îlan dike.

-Koneferans, li welatên ku Kurd lê dijîn ji bo parastina mafên însanî bi riya komîsyonekê berdewamkirina xebatê dixwaze, di vê manê de ev komîsyona ku mesûliyeta wê li ser France-Libertes ê ye ji parlamenterên hemû welatên demokratîk re vekirîye;

- Konferans, dixwaze ku nûnerên gelê Kurd ji bo Parlamentoya Ewropayê, Konseya Ewropayê û ji bo hemû civînen navnetewî yê mezin bîn vexwendin.

-Konferans daxwaz dike, divê ku qanûn ên netewî çêkirina çekên kîmyayî yasax bike û ew welatên ku peymanên navnetewî îhlal dikin û çekên kîmyayî yan jî yê biyolojîk bi kar binin, divê hemû hukûmet li dij derkevin û ji bo ku li hember wan mûeyîdeyên aborî û diplomatîk bîn bi kar anîn, konferans ji hemû hukûmetan daxwaz dike ku di vî warî de divê piştgiyariya çêkirina peymaneke navnetewî bikin.

Konferans, bi armanca ku di Asambla Neteweyên Yekbûyî û hemû civînen mezin yê nav netewî de statuyek nûnertiyê bigre avakirina organîsasyoneka ku hemû gelê Kurd temsîl bike pêşniyar dike.

-Konferans, bi teşebusa Prof. Saharov ji Sekreterê Giştî yê Nete-veyên Yekbûyî daxwaz dike; ji bo garantiya aştiya navnetewî, divê li ser mesela Kurd Heyeta Giştî civîneke taybetî çêbibe.

-Konferans, balê dikşîne ser rewşa Kurdan a dramatîk, bi wê dîtina ku daxwaz û hêviyên vî gelî bête diqetgirtinê, bi taybetî divê ji wan re alîkariya humanîter bête dayin, ji bo alîkariyek aktîf, bi Komîseryata Bilind a Multeciyan divê bi hawakî acil têkilî ji nuh ve destpê bikin; di der heqê vê bûyerê de divê Komîseryata Bilind a Multeciyan civînekê çê bike.

-Konferans, vê qedera gurûbên Kurdan ku mecbûr mane cî biguherin mahkûm dike, ji wan dewletên ku bi vê rewşa Kurdan ve al-qadar in daxwaz dike ku ew rîayetî prensîbên huqûqî yê navnetewî bikin, ger ev grûbên Kurdan bixwazin, daxwaza konferansê jî ew e ku divê ji wan re alîkariya humanîter bête kirin.

-Konferans ji bo ku organîzasyonên navbera hukûmetan û yê li derî hukûmetan bikaribin bi qurbanên ku mecbûrî koçkirine bûne re bi awakî serbest têkiliyê deynin divê qerara 8'ê Çileyê Pêşin a 1988'an 43/131 a Asambleya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bê bi cî anîn.

-Konferans ji bo ku li Kurdistanê Mafên însanî bîn parastin îlan dike ku wê di himaya Komîta Swêd de, berî Tîrmeha 1990'î ji nuh ve li Stockholmê bicive.

Arêkerdax: Malmîsanij

'EYŞÊ(1)

Herê 'Eyšê, 'Eyšê, 'Eyšê!
Herê 'Eyšê, cexra weşê!
Herê 'Eyšê, 'Eyšê, 'Eyšê!
Herê 'Eyšê, cexra weşê!
Keynê 'Eyšê, cexra weşê!

Hendi surê, hendi sipiyê,
Hendi surê, hendi sipiyê,
Saya sura Melatîyê(2),
Hinara Dêrikîyê(3),
Çileya qazaxiyê!

Serê banê bawkê 'Eyşi cerran o,
Binê banê bawkê 'Eyşi cerran o.
Sênawo sipî virran o.
Bawkê 'Eyşi şiyô Pîrano(4).
-To rî çina wû çina ano(5)?

-Mî rî şa'r û qundîran ano,
Mî rî şa'r û qundîran ano.
Meşti nê bêro roşan o.
Qundîran kena xwi lingan o.
Şa'ri dana xwi kiftan o.

Serê banê bawkê 'Eyşi camî yo,
Binê banê bawkê 'Eyşi camî yo.
Camî weqfê Rebbî yo.
Herê 'Eyšê, 'Eyšê, 'Eyšê!
Herê 'Eyšê, cexra weşê!

Herê 'Eyšê, ina (ona) meki!
Herê 'Eyšê, ina meki!
Keynê 'Eyšê, ina meki!
Xortan banderê xwi meki!
Yew tenî banderê xwi ki!

Herê 'Eyšê, ina meki!
Serê dew ra zozan meki!
Binê dew ra zozan meki!
Xortan rî derd peyda meki!
Yewî tenê banderê xwi ki!

1 Na deyîri heway vatişê yew Dêreyîji nusiyaya (Dêrey yew dewa qezayê Pîranî ya).

2 **Melatî:** şaristanê Meletî, Meletê, Melatya (Tirkî di: Malatya)

3 **Dêrikî:** Nameyê yew qezayê Mêrdînî yo (Kurmançî di: Dêrika Çiyayê Mazî, Tirkî di: Derik)

4 **Pîran:** Yew qezayê Diyarbekir o. Dewleta Tirkîye nameyê yê bedilnawo, kerdo Dicle.

5 Herinda nê cumleyan di, tay varyantan di enawa vajiyêno:
"Bawkê 'Eyşi şiyô Edenawo.
-Dey rî çina wû çina ano?"

Yan zî enawa vajiyêno:

"Bawki 'Eyşi şiyô Pîrajmono,
-De rî çina wû çina ono?"

Edena: Şaristanê Adana, Edna (Tirkî di: Adana)

Pîrajmon (Pîrejman): Yew dewa qezayê Pîranî ya. Dewleta Tirkîye nameyê na dewî bedilnawo, kerdo Kurşunlu.

HUSÊ HAJÎ¹

Na deyîri samedê kişiyayîşê Husê Hajî ra vajiyaya. Husê Hajî Pîrejmon (Pîrejman) ra bi. Yê û cenîya Mistê Bezi Leyla zeri devistîbî yewbînan. Vatişan gore, samedo ki Hus û Leyla tê reydi wardenî roşenî, mêrdey Leyla Mistê Bezi, Husê Hajî kişeno². Na deyîri, na mesela ser o ya.

Leyro, leyro, leyro, leyro!
Leyro, leyro, Huseynê mi!
Leyro, may to bimro, cahîlê mi!
Huso, bawkê to³ dost bi ki to rî vato,
Bawkê to dost bi ki to rî vato.
Huso, to tim çakuçê xwi piro dawo⁴.
Huso, to peyen tê di verdawo.

Leyro, leyro, leyro, Huseynê mi!
Leyro, leyro, leyro, cahîlê mi!
Leyro, may to bimro, ciwanê mi!
Odey Husê mi sara ya.
Qarşî dişmenî pencera ya.
Yar û dostay to Leyla ya⁵.
Dostay Husê mi Leyla ya.
Ina Leylaya 'ewara ya,
Sebeba Hus û Mistî piya ya.

Mi va meşo, Husê m' meşo!
Wa adir dekwo, banê m' veşo.
Banê m' çino, wa ganê m' veşo.
Heywax, leyro, leyro, Husê m' leyro!
Huso, Mist çî niyo, name giran o.
Leyro, Mist çî niyo, name giran o.
Tornê Ehmedê Adan o⁶,

Surmey modelî kay dano.
Gêno qesasê pîrbavan o.

Huso heyran, bawkê to
barê xwi wenawo.
Leyro, piy to barê xwi wenawo.
Terxoney Xeylon⁷ di ronawo⁸.
Leyro, leyro, leyro, leyro!
Leyro, leyro, Huseynê mi!

1 Na deyîri heway vatişê yew dengbêjê Dêreyîji nusiyaya.

2 Samedê kistişê Husê Hajî ra, Mistê Bezi serranê 1958-1959'di Hefîsxaney Diyarbekir di bi. Na ra fahm beno ki Husê Hajî 1958 ra ver kişto.

3 **Bawkê Husî (Piy Husî):** Haj Wis (Hajî)

4 **çakuçê xwi piro dayiş:** riki kerdîş, 'eynadey kerdîş, zey xo kerdîş, goş kesi nênayiş

5 **Leyla:** Cenîya Mistê Bezi bi.

6 **Tornê Ehmedê Adan** (Tornê Ehmedê Adon): Mistê Bezi

7 **Terxone** (Terxene): Nîzdîyê Palî di, Koy Sipî di yew dew a.

8 Bawkê Husî, Haj Wis'î (Hajî) key xwi wenabi, berdbi Terxene (cenîya Haj Wisî, Terxene ra bi).

GULÊ*

Way Gulê, wa bo, wa bo!
Yaz (Yazi) û qeder abo.
Gul kol (qol) vet ê wa bo.
Kêberê mahkema abo.

Dayê, vanê şew tarî ya.
Fenera Xalo'y biya.
Ê xalodê kî ya?
Ê Xalodê Qirqa biya

*Na deyîri zey vatişê yew Çermûgîji nusiyaya.

Deyîrê ma

ZILFOYÊ MÎ¹

Na deyîri mergê Zilfoy Mehemê Periki ser ra vajiyaya. Zilfoy Mehemê Periki, dewanê Pîranî ra Qelbîn ra bi. Xortaneya xwi di nêweş kewtbi, Diyarbekir di xestexane di 'emeliyat bibi û samedo ki 'emeliyat ra pey aw şimitîbî (werdîbî) - vatişan gore 1964 di- merdbi.

Gidî leyro, leyro, leyro, leyro!
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, day nemayê!
Dayê, dayê, Zilfoyê mi!
May to bimro, ciwanê mi!
Day êre wo, rojawan o,
Koyan girewto mij û duman o.
Çimanê mi girewto mij û duman o.
Zilfoy mi, ez heyran o, hesiran o.
Tim bihowniya (b'ewniya)
beşna xortano.
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, Zilfoyê mi!

Dayê derdê mi zav o, zav(2) giran o.
Dayê derdê mi zav o, zav giran o.
Derdê to ca mi nêdano.
Ax dayê, dayê, day nemayê!

Zilfo, va werişto, vay-welekî.
Leyro, çimê to sîyay belek î.
La ez qirbanê ay felekî.
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, Zilfoyê mi!

Day êre wo, rojawan o.
Day êre wo, rojawan o.
Zilfoy m' şiyô serê banan o.
Çakêt visto serê polan o.
Dayê, Zilfoy mi esker o, esker şono.
Mi va qey nefesê ganê xwi vera dano.
Mi nêzana Zilfoy mi mi ca verdano.
Leyro, Zilfoy mi mi ca verdano.
Zilfoy mi beno meytê gorrano.
Zilfoy mi beno şarê qebran o.
Zilfoy mi beno cîranê ewliyan o.
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, Zilfoyê mi!

Zilfo heyran, va yeno, vayê koyan o.
War keno xinçê(3) banano.
Derdê mi şarê mezelan o.
Zilfoy mi, ez bimiro, ez nêmano;
Serey mi serey derdan o.
Kulê to ca mi nêdano.
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, Zilfoyê mi!

Ax leyro lurî, leyro lurî!
Leyro lurî, Zilfoyê mi!
Leyro, teyr yeno, teyrê 'eburî.
Pelê xwi dano Koyê Wirî(4).
Pel dano Deştê Pîrmensurî(5).
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, day namayê!

Leyro, ez paştî bestena datîzano.
Zilfî xwi reydi ray kena xestano(6).
Ez bimiro, ez nêmano!

Mi nêzana Zilfoy mi beno dano
destê toxtor(7) û hekîmano.
Teresê toxtorî Zilfoy m' fineno fekê
kardîyan û meqesano.
Zilfoy mi biyo şarê ki xestano.
Zilfo biyo şarê 'emletano(8).
Zilfo biyo şarê qarulano(9).
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, day nemayê!

Teres toxtorî Zilfoy m' bestîni,
girê daynî.
Destê Zilfoy mi girê daynî.
Hemşîra (?) Zilfoy mi çarnaynî.
Gangêrî ca Zilfoy mi nêdaynî.
Zilfoy naylonê xwi qerefnaynî.
Qawuşî miyan ra geyraynî.
Zilfoy mi bêhêş veyn daynî.
Veynda mi feqîri daynî.
Howniya (Hewniya) bawo cay n'asaynî
(nêhasaynî).

Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, day namayê!

Leyro, zerencê kerrî peltenik o.
Mi va wa toxtor Zilfî m' daru ko,
teslîmê mi ko.
Ax dayê, dayê, Zilfoyê mi!
Ez bimiro, cahîlê mi!

Zilfo, payîz o, wextê xebaran o.
Payîz o, wextê debaran o.
Şar pê şaneno zixirano.
Mi va Zilfoy mi esker o, esker şono.
Wilay mi nêzana Zilfoy mi mi ca verdano.
Zilfo beno meytê nê qebrano.
Ax dayê, dayê, day nemayê!
De dayê, dayê, ez namayê!

1 Na deyîri heway vatişê yew dengbêjê Dêreyîji nusiyaya.
2 **zav:** zaf, zof, bol
3 **xinç:** xîç
4 **Wirî:** Yew mezraya dewa Kuferb (Kufarbi) a, qezayî Pîranî ser o ya.

5 **Deştê Pîrmensurî:** Nîzdî Pîranî di yew deşt a. Ti ra "Deştê Dêrey" zî vajiyêno.

Pîrmensur (Pîrmansur, Pîmsur): Nameyê yew ewliyan o ki seserra desini (10. yüzyıl) di çiyawo (yaşamış). Vatişan gore Pîrmansur bi xwi verî yew dizd biyo, samedo ki çiy xwi yo tirawite (tirite) dawo feqîran, biyo ewliya. Tirba Pîrmansurî nîzdî Pîranî di dewa Dêrey dir a û zîyar a.

6 **xeste:** xestexane

7 **toxtor:** doktor, doxtor, tortor

8 **'emlet:** 'emeliyet, 'emeliyat, 'emlet, 'emeret, 'emaret (Tirkî di: ameliyat).

9 **qarula:** qaryola, qarila (Tirkî di: karyola).

ZAZACA-TÜRKÇE
SÖZLÜK
FERHENGÊ
DIMILKÎ-TIRKÎ

adresa waştîşî:

Post Box: 240 12
750 24 Uppsala
Sweden

Na xumzum a...

Hukumeta Îngilîz hat protestokirin

Roja 15'ê Çiriya Pêşin li dor 5 hezar kesî bi meşeke girseyî politîka hukumeta Îngilîz a qebûlnekirina multeciyan siyasî ku bûbû sebebê mirina Şêxo Îyîguven, protesto kirin.

Wek ku xwendevanên me wê bibîrbîn ku me di hejmarê berê ya Armancê de nivîsbû, Şêxo Îyîguven û Dogan Arslan; du Kurdên ji Pazarçikê -qeza Meraşê- ne. Wan jî wek bi hezaran bajariyên xwe van 6 mehên dawî îlticayê Îngilîstanê kiribûn. Hukumeta Îngilîz îltica wan qebûl nekiribû û ji bo ku wan ji pa ra bişîne, ew girtibûn û li kampeke nêzî balafirxana Heathrowê bi cî kiribûn. Şêxo û Dogan ev politîka Îngilîzîtanê protesto kirin û xwe şewitandin. Şêxo mir, Dogan jî birîndar bû.

Ji bo vê yekê, Mala Gel(Halkevi), Komela Karkirên Kurdistan û Yekîtiya Karkiran li Londrayê bi hev re meşek çê kirin. Di meşê de çî bigre hemû hêz û rêxistinên Kurd û Tirkên ên ku li Îngilîstanê piştgirê wan hene, hin rêxistinên demokratîk ên Îngilîz û hin rêxistinên penaberên biyanî beşdar bûn.

Li ser bûyera Şêxo û politîka hukûmeta Îngilîz, Komîta TEVGER'ê ya Londrayê û Komela Karkirên Kurdistanê cihê cihê belavok belav kirin. Dîsa Komela Karkirên Kurdistanê bi Mala Gel û Yekîtiya Karkiran re li Londrayê belavokek muşterek belav kirin.

Komîta TEVGER'ê ya Londrayê di belavoka xwe de ji bo bûyerên bi vî rengî tekerur nekin, weha got;

"Hemû multeciyan Kurdistanê û Tirkiyê!

Em rûyê Home Office(Daîra multeciya) û Wezîrê Hundir; Douglas Hurt ku di mirina Şêxo Îyîguven de berpirsyar in, eşkere bikin. Ji bo politîka hukumeta Îngilîz a piçûkxistinê(distkrimir) ya li dijî îlticaciyan Kurd bê tesîr bikin, divê em dest bidin hev. Bes yekîtiyek me ya xurt, dikare wan bitirsîne û paş de vekîşîne".

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

Serejêr: 1-a) îlaç. b) Heywanekî ku li gor dinê islamê goştê wî herem e. 2-a) Ne nişiv, ne berjêr. b) Li gunda odeya ku kayê dixinê. 3-a) Beyraq(berevajî). b) Heywanekî bi six ku di qulan de dijî û goştê wî tê xwarin. c) Giyayekê ku tevli penîr dîkin. 4-a) Cihê bê şer û qelebalix, ewlehî(berevajî). b) Ji navê qîzan. 5-a) Dewarek(berevajî) b) paşdaçkek. 6-a) Emrê fiila "hatin" ê (berevajî) b) Li devera Çolemêrgê eşîrek. 7-a) Pêxwarînek, penîrê bi sîr(koçer çêdîkin). 8) a-"Xem", "jan", "kul". b) Li Asyayê golek. c) Vexwarîneke serekî. 9-a) Di Kurmancî de pronaveke îşarkî. b) Mehek ji mehên biharê. c) Sînonîmek ji bo "yek". 10-a) Edalet. b) Tiştê pîrr kevin. 11-a) Peyveke gazîkirinê(berevajî). b) Li Kurdistana Sûriyê, li Dêrikê seyrangehek. 12-a) "Xaniyê" koçeran, reşmal. c) Baneşanek(berevajî)

Çeperast: 1-a) Xweşkok, spehî, ciwan. Her weha navê keçan. b) Li Behdînan û Çolemêrgê ji bo "rêwî", "rêbar" dibêjin. 2-a) Pirjîmarra pronava îşarkî ji bo kes û tiştên nêzîk. b) Kar, şîxul(berevajî). 3-a) Du herfên wek hev. b) Heya, şeref. c) Nawala ne pîr kûr. 4-a) Xwarîneke sivîk ku ji şîr çêdîkin. b) Bîna, xaniyê kamil, tamam. 5-a) Peyvek ji Erebi ketiye zimanê me û bi ma'na "ezab", "îşkençe", zilm" bi kar tê (berevajî). b) Nêrîna bi me'ne. 6-a) Du dengdaran wek hev. 7-a) qul. b) Li mala cihê ku gula dîkinê û ji bo xemla odê li ser masê datînin, vazo. 8-a) Bayê xurt ê ku bi baranê re tê. b) Navekî kuran. 9-a) Di Kurmancî de paşdaçkek(berevajî). b) Kar an fiilê paqîşkirina dan; berî ku

Bersîva hejmarê 97'an

Çeperast: 1-a) mendere. b) bêla. 2-a) li. b) êzing. c) mar. 3-a) rik. b) êvar. c) olî. 4-a) êç. b) rîşad c) îk. 5-a) kin. b) maf. 6-a) ard. b) seyr. 7-a) wa. b) îşk. c) ka. 8-a) serdar. b) av. c) rb. 9-a) îtbiq. b) dred. 10-a) serane. b) tren. 11-a) sar. b) mê. 12-a) tv. b) Qasimlo.

Serejêr: 1-a) mirêba. b) sî. c) rû. 2-a) eliç. b) rwets. 3-a) darbest. 4-a) dê. b) dirav. 5-a) ezîrip. b) aqar. 6-a) rivîn. b) îr. 7-a) enaş. b) aş. c) dema. 8-a) gram. b) kar. c) ês. 9-a) das. b) vet. 10-a) êmo. b) fek. c) drem. 11-a) lalî. b) yar. 12-a) arîkar. b) bendo.

Dûmahîka nivîsan

Gundê wêran

Ez vê pîrsa dawî ji Îsmail Çolak dikim:

-Ku tu anuha jî di wê rewşê de bî, tuyê cardin wan tiştan bikî?

Îsmail Çolak bi her halê xwe fena ku aciziya xwe nîşan bide, dibêje:

"Tu viya fêm nakî birayê min, heger ew bûyer nehata jiyandin wê jiyaneke min a ji xweşikyan mişt hebûya. Yên ew tetik kişandin ne em bûn. Em jî zarokên gel in. Dibe ku beden, a me bû, lê ruh ne yê me bû. Ez reviyam, bi salan jî insaniyeta xwe re-

viyam. Ew ro û ev ro ye, ez sîleheke lîstokê ji bibînim madê min jê digere, dilê min li hev dikeve. Ez ji insaniyeta xwe fedî dikim. Carek din rewşek wer! Xwedê bisitirîne. Qet tu qewetek dinyayê jî nikare sîlehê bide destê min..."

Li malê rûniştîme, materialên, nivîsên fotografên ku min civandine min li dora xwe belav kirine û difikirim. Di serê min de bi hezaran pîrs dijenin. Giş ji pîrsên bê bersiv in. Bi alî Çemê Sefo ve dimeşim.

Çiya kepir in, bê dar, bê hişnayî ne. Heta ku çav dibîne dirêj dibe. Gir derbas dikim. Aliyê hember Îran e. Li ber min Çemê Sefo. Çemekî hişk. Ne av, ne hişnayî, ne dar... Qet tiştêk tune. Eskerên li ser sînor dewriyê digerin min dibîbin. Têna ba min. Ji min re dibêjin tu çî digerî. "Ev herêma herêmek yasax e". Ez dibêjim ez rojnamevan im. Li kîmlîka min dinêrin. Dibêjin "Megere, yasax e!" Vedigerim gund.

Ders û hêviyên ji Konferansa Parisê

Û her wek wan jî Kurd hebûn. Divê bi vî awayî li Konferansê bê nehîrtin. Lê tevî vê jî şaşî û kêmasiya esasî ya vê Konferansa navnetewî ew bû ku, Kurd ne bi navê hêzên xwe yê siyasî lê wek şexs hatibûn vexwendin. Pîrs pîrsa gelê Kurd bû, bi hêzên siyasî yê Kurd re tu guftûgo û muşawere çênebûbûn. Mêvanên din çiqas hay ji Konferansê hebûn, Kurd jî hewqas hay jê hebûn.

Helbet sedemên esasî yê vê yekê berî her tiştî siyaseta keysperestî ya Fransa, pişt re rewşa Enstîtuya Kurd a Parisê bû ku wek muşawerê Kurdî ya serbixwe bi rola xwe ranebû, ya dawî jî bêprogramî û bêserûberiya hêzên siyasî yê Kurdistanê bû. Hin hêzên siyasî jî mej ve hay ji vê konferansê hebûn, heta beşdarî hin karên dema destpêkê jî kiribûn; tevî vê jî bi wê rola xwe ranebûn ku tevgera siyasî ya Kurdistanî bi hevparî û yekdengî karîbe giraniya xwe deyne ser amadekirin û lidarxistina Konferansê û encamên wê.

Digel hemû şaşî û kêmasiyan, Konferans gawek pêş bû ji bo enternasyonalîzekirina pîrsa Kurdî, bi vî wesilê carek din bala rayagiştî ya cihanê ket ser jiyana trajedî û liberxwedana gelê Kurd.

Hefta Kurdistanê bi serfirazî...

Berpirsiyarê Partiya Sosyaldemokrat Hans Göran Frank jî got ku, ji ber ku hukumeta Tirkiyê multeciyan Kurdan wek multeciyan siyasî qebûl nake, ev yek jî rewşa wan xirab dîke.

Di Roja dawiyê ya hefta

Kurdistanê de İsmet Şerif Wanlî li ser dîroka Kurdistanê û li ser rewşa Kurdên Ewrûpayê semînerêk bi zimanê Îngilîzî da.

Yekîtiya nivîskarên Kurd li Swêdê bi xwendina helbestan beşdarî hefta Kurdistanê bû. Şairên Kurd ku

li Swêdê dijîn Şerko Bêkes, Malmîsanîj, Heme Saîd Hesên, Mueyed Teyîb, Refîk Sabîr, Xelîl Dihokî, Xebat Arîf, Mehîfûz Mayî û Sulêman Qasimyanî bi xwendina şîrên xwe hefte dewlemend kirin.

"Gelê di Talûkê de: Kurd"

Porter, Jimy Bates, Connie Morella, Ben Blaz, Ben Gillman, Thom Lukens û gelek kesên din beşdar bûn. Berpirsiyarê Wezaretê DYA jî wek çavdêr beşdar bûn.

Di konferansê de axaftina pêşîn Sanator Kennedy kir. Ew di axaftina xwe de li ser zulma ku li Kurdan dibe sekinî û bangî Kongra DYA kir ku zorê bidin Yekîtiya Netewan, da ku ew li ser pîrsa Kurd civînek taybetî çê bikin. Dûre weha got: "Êdî wê nema civaka navnetewî û dinya medenî bêdeng bimîne li hember tiştên ku gelê Kurd ê mezlûm dikîşîne".

Piştî axaftina Edward Kennedy, serokê konferansê Thoms Lantos, D. Mitterrand dawetî mikrofônê kir.

Mitterrandê di axaftina xwe de qala peymanê Lozanê kir û got wê peymanê, peymanê Sevrê ku mafê niştîman dabû Kurdan ji holê rakir. Aleqaderiya xwe ya bi mesela Kurd jî bi nûçeyên trajîk ku van salên dawî jî her çar perçên Kurdistanê tên ve girê da. Dû re bi dîr û dirêjî qala ziyareta xwe ya Kurdistana Tirkiyê ya wê havîna çûyî û konferansa Parisê kir. D. Mitterrandê dî re weha got: "Di tîkîl-bûyîna karê welatêkî û laqayî mayîna li hember xelkekî ku zulm lê tê kirinê de hudûdekî gelek zirav heye. Ma emê parastina mafên esasî yê van mirovan ji welatên ku heta nuha li wan zulm dîkin re bihêlin?"

Di dawiya axaftina xwe da weha got: "Dema ez çûm kampên multeciyan Kurdên Iraqê yê li Kurdistana Tirkiyê, mirovên ku li kampên hûn weha diqirîyan 'Me ji bir meke xanima Mitterrand! Bêdengî me dikeje!' Wan jî bir nekin, bêdengî wan dikeje!"

Endamê Meclîsa Nûneran John Porter jî di axaftina xwe de weha got: "Di serî de ez û ev kesên ku di konferansê de beşdar bûne em neferên ordiya parastina mafên Kurd in. Divê em wiha bîn qebûl kirin."

Dewleta Tirk, çapemeniya bûrjuwazî ya kolonyalist bi rojan qala wê konferansê kirin û nerazîbûna xwe dan diyarkirin.

Penaber wê ji deriyê sosyalê xilas bibin

Hukumeta Swêdê dixwaze sîstema xwe ya qebûlkirina penaberan biguherîne. Sedema daxwaza guhertina sîstema nû zêdebûna alîkariya aborî ku ji penaberan re tê kirin e. Ev demek e ku ji bo pêşniyara qanûnek nû ji alî Wezaretê Kar û Federasyona Belediyên Swêdê ve xebatê kirin.

Li gor Bo Goransson, li Wezaretê Kar berpirsîyarê pirsên biyanîyan, pêşniyara qanûnek nû wê di buhara 1990'î de amade bibe û wê pêşkêşî parlamentoya Swêdê bikin û wê ji 1'ê Tîrmeha 1990'î wê bikeve praktîkê. Bo Goransson dibêje "Armanca me ew e ku penaber ji devê daîra sosyalê xilas bibin" û dom dike.

-Penaber roja ku tene Swêdê restarast xwe li ber deriyê daîra sosyalê dibînin. Ev yek qet ne baş e. Ji aliyekî ve ev ji bo her kesî rewşeke ne xweş e û ji aliyê din jî kesên ku kar dikin tîne provakasyonê.

Di rewşa îro de her belediye ji bo penaberan alîkariya civakî ji dewletê distîne. Ev alîkarî çar sal dom dike. Bikaranîna van perên ku belediye ji dewletê distîne bi qanûnan hatiye tesbîtîkirin. Ango belediye nikarin van alîkariyan li gor kêfa xwe bi kar bînin. Li gor qanûna nû ev yek tê guhertin. Belediye wê mîktarek pere bistînin û ji bo bikaranîna van pereyan wê bi xwe programa xwe çêkin.

"Di qebûlkirina penaberan de hedefa me afirandina welatîyên ku dikarin bi Swêdî bipeyivin, e" dibêje Bo Goransson û gotina xwe wiha didomîne.

-Însanên ciwan û xwenda ku xwe gîhandine ne hewcedarê xwendinek dût û dirêj in. Lê yê din divê bi salan bixwînin û ji wan re xebatek dût û dirêj divê. Lê belê penaber ne pêwîste e ku îdara xwe bi alîkariya daîra sosyalê bike. Ji bo di civakê de cîhstendîne, divê sed riyên din ên baştir hebin.

Li gor pêşniyara nû wê penaber raste-rast herin daîra kardîtinê û li vê derê belediye ji bo wan di ciyê alîkariyê de karê amadekirinê (beredskapsarbete) peyda bike.

-Divê em sînyalên rast bidin penaberan. Tev jî dixwazin kar û barekî heja bikin, lê em berê wan didin girêdanê. Em bi daxwaza xwe ya erînî û bi nezaniya xwe wan îzole dikin û dixin perîşaniyê, Bo Goransson dibêje.

Li gor Bo Goransson ji bo penaberan problema herî mezin hîndekariya zimanê Swêdî ya nebaş a îro ye. Ji bo pêşdebirin û başkirina hîndekariya zimanê Swêdî hem li meclîsa bilind a dibistanan û hem jî li daîra aborî ya merkezî lêkolînên kirin. Encama van lêkolînan wê ji bo hîndekariya zimanê Swêdî bibe bingeh ku perçek ji xebata qebûlkirina penaberan e.

-Hîndekarî hem li kampan û hem jî li belediyên wê baştir bibe. Forma dibistanan wê li gor xwendekaran bête tesbîtîkirin û encamên ku wê bi dest bikevin bêtin taqîbkirin, Bo Goransson dibêje.

Sîstema nû ya qebûlkirina penaberan hêj bi kûr û dirêj ne amade ye. Yek ji probleman helkirina pirsê dîtina kar li belediyên biçûk e. Eger ev yek neyê helkirin ihtîmalek mezin e ku penaber xwe li ber deriyê daîra sosyalê bibînin.

Anders Wenstrom ji Wezaretê Kar û Şefê beşa biyanîyan li ser sîstema nû wiha dibêje:

-Heya nuha me munaqesha wê pirsê ji alî îdeolojîyê ve kir. Kesên ku tev li vê munaqeseyê dibin li ser çarkeşebûn û nebaşbûna sîstema nuha di yek baweriyê de ne. Emê qebûlkirina penaberan ji nû ve ber bi çav bikin û daîra sosyalê ji navberê rakin. Dema me formek da karûbarê xwe yê li ser sîstema nuha, me qet bawer nedikir ku wê rojek tengasiya karkir peydakirinê derkeve pêşiya me û ji ber vê yekê jî me berê peran da daîra sosyalê.

Sîstema nû ya qebûlkirina penaberan ji nuha ve bala hin belediyên kîşandîye. Hin belediye li ser vê yekê dest bi lêkolînan kirine jî.

Bi kurtî mirov dikare bibêje ku xilasbûna penaberan ji deriyê sosyalê tiştekî pirr erînî ye. Penaberên ku dê werin Swêdê wê bikaribin bi keda xwe xwe îdare bikin. Kompleksên ku bi alîkariya daîra sosyalê derkevin holê wê wînda bibin.

Ji aliyê din dema berpirsîyariya siyaseta biyanîya dewrî belediyên bibe wê bi xwe re tiştên ne xweş jî bîne. Carek divê siyaseta biyanîya merkezî be û ji alî hukumetê ve bête tesbîtîkirin. Ji nuha ve em dizanin ku belediye hene ku biyanîyan qebûl nakin û di dijîtiya biyanîyan de rolek girîng dileyîzîn.

Hesen Mizgîn

Bi siyaseta peerstroyka û glasnostê ne tenê di sîstema sosyalîst de lê li hemû dinê guhertinek ber bi çav çêbû. Di hin dewletên sosyalîst de -wek Polonya û Macaristan- û bi taybetî jî li YKSS'ê gavên ku hatin avêtin ji bo dermankirina hin birînen şaşîtiyên berê wê rolek girîng bileyîzin.

Hedefa sosyalîzmê jî bo karkir û kedkaran afrandina jiyaneke baş e. Di vê xebatê de bi kapitalîzmê re reqabet û ji holê rakirina wê jî her armanca sosyalîzmê ye. Ji ber vê yekê jî sosyalîzm jî her aliyê ve divê ji kapitalîzmê pêşdetir be, modertir be.

Şik jê tune ye ku îro guhertinên ku li welatên sosyalîst dibin ji bo avakirina sosyalîzmê ye. Hedefa siyaseta perestroyka û galsnostê jî pêşdebirina sosyalîzmê bi xwe ye. Pirr mixabin ku hin welatên sosyalîst di vê babetê de gavên pêdivî navêjin û meydanê ji dijminên sosyalîzmê re dihêlin.

Siyaseta perestroyka û glasnostê di pirsê netewî de jî hin rastîyan derxist holê. Heya îro me wisa dizanibû ku pirsê netewî li YKSS'ê hebûye. Lê pirr mixabin bûyerên ku îro li Komarên Letonya, Estonya, Azerbaycan, Gurcistan, Maldovya û Ukranyayê dibin nîşan didin ku hêj pirsê netewî ji gelek waran hel nebûye û mirov dikare bibêje ku ev mesele di ciyê xwe de maye û qet pêşde neçûye. Heta di hin komaran de -wek Azerbaycan- paşde çûye.

Dema min nivîsa Prof. Dr. Şakîrê Xudo Mihoyî li ser "Rewşa Kurdan li Azerbaycana Sovyetê" (Berbang 59, r. 5) xwend ez ji nişka ve varqilim. Cama di hate gotin ku "erê, Kurd li Sovyetê rehet in lê tu mafên wan ên netewî tune ye" lê min bawer nedikir. Ji ber ku min bawerîya xwe bi "hostayê" Stalîn anîbû. Lê pirr mixabin ku rastî ne wek min bawer dikir, e. Erê, di helkirina pirsê netewî de hin gav hatine avêtin lê hew. Tiştên ku hatine nivîsin li ser kaxîzê mane û ji xwe yek ji sedemên paşdemayîne jî ev e.

Di civîna Komîta Merkezî ya PKYS'ê de ku di 20'ê îlona 1989'an de hat lidarxistin li ser pirsê netewî wiha tê gotin; Li Yekîtiya Sovyetê pirsê netewî di van demên dawiyê de bû pirseke pirr ciddî. Lê belê wisa xuya ye ku ev pirs ne îro, lê jî mêj ve ye ku ciddî ye. Ne bi xêra Komarên li Baltîkûmê bûna belkî pirsê netewî bi hemû tarîtiya xwe dernediket holê. Wekî din car carna gelêşa gelên li komarên Sovyetî yê li Asyayê dihat bihîstin lê belê cidîyeta van gelşan nedihat za-

nîn. Îro ev gelşên han bi hemû sedemên xwe li holê ne. PKYS biryara xwe daye ku pirsê netewî hel bibe.

Li Yekîtiya Sovyetê îro nêzî 100 netewe hene. Di van 72 salên piştî Şoreşa Oktobê de ev 100 netewe hînî hevûdû bûne. Herçiqas carcarna dijîtiyên wan derketine holê jî jiyanê xwe ya cînartiyê domandinê. Hissiyeta enternasyonalîzmê ne bi gelemperî be jî hatiye afirandinê. Lê belê di hin ciyan de û ji bo hin netewan enternasyonalîzm li ser gotinê maye. Di vê babetê de Komara Azerbaycanê nimûneyek e.

Eger komarek "sosyalîst" jî ber menfîetên xwe û jî ber hin dijîtiyên netewî riyên transportê ku diherin komarên din bigre û neteweyekî bixe tengasî û birçîtiyê mirov nikare qala enternasyonalîzmê bike. Kirinên Komara Azerbaycanê li dij Komara Êrmenîstanê "enternasyonalîzma" Azerbaycanê xweş nîşan didin.

Di pirsê Kurdan de jî kirinên Azerbaycanê nîşan dide ku Azerbaycan ne di şopa Lenîn, lê di şopa Stalîn de ye. Ji bo neteweyên biçûk wek Kurd, Alman, Tatar û Tirkên Abaza stratejiya Stalîn, belavkirin û asimilasyona wan bû. Ji ber vê yekê jî piştî mirina Lenîn, dest bi belavkirina -hemû jî bi zorê- netewên piçûk hat kirin. Sedema belavkirina Kurden li Sovyetê jî ev e. Di vê babetê de Ada Kan (pispora Zanînen Siyasî ji YKSS'ê) wiha dibêje; "Nêzî milyonek Kurden Sovyetî sê car bi zorê hatin nefîkirin û berê wan dan sê komar, 14 herêm û 110 navçeyan. Daxwaz, asimilasyona wan bû. Kurd tim û tim bi tiştên derewîn hatin îthamkirin -ev yek ji siyaseta stalîn û nefîkirinê mabû." (UNT 9. 10. 1989) Di stratejiya belavkirin û asimîlekirinê de Prof. Şakîrê Mihoyî jî wek Ada Kan dibêje; "Di salên koletiya ferd(mebest li vir dema Stalîn, şexsperestî, ferdperestî ye. N. M.) û "zastoya" de (peyva "zastoya" bi Rûsî ye û bi mana cimûd, bê pêşketin, wek xwe mayî têt bi kar anîn) qala rewşa Kurda li Azerbaycanê dibû"(Berbang h. 59, r.6)

Di pirsê Kurdan de siyaseta Azerbaycanê -di eslê xwe de siyaseta merkezî ye- pirr bi balkeş e. Dema ku mirov lê dikole sedema şerê Azerbaycanî li dij Êrmeniyên li Nagorno Qerbaxê bi rehetî têdigîhe. Karbidestên Azerbaycanê hêj di salên 1920'an de dest bi asimilasyona Kurdan dikin. Wek tê zanîn di van salan de kuştin, talankirin û sirgûnkirina gelê Kurd li Tirkîyê aktuel e. Di

salên 1895-96, 1909 û bi taybetî jî sala 1915'an de qetliama Êrmeniyana jî alî Tirkan ve, xweş diyar e. Daxwaza avakirina dewleta Ermenîstanê û Kurdistanê bi fêlbaziya Mustafa Kemal û hevalên wî têt çû. Ev siyaseta M. Kemal û hevalbendên wî li Azerbaycanê jî alî "komunîstan" jî hat ajotin. Karbidestên Azerbaycanê di şopa biryarên xwe de çûn û dest bi asimilasyona Kurdan kirin, perçek ji Êrmenîstanê jî xistin nav sînorên xwe. Ji ber vê yekê ye ku di dîroka Azerbaycanê de tu car qala zordestiya dewleta Tirk li ser Kurdan nehatiye kirin. "Mixabin em mecbûr in tespît bikin ku hemû kirinên Kemal û Kemalîyan, ne ku ji aliyê Azerbaycanîyên Tirkas ve nayên rexnekirin, lê belê heta neyên qebûlîkirin jî."(Prof. Ş. X. Mihoyî Berbang h. 59 r. 6).

Di pirsê dijîtiya Kurd û Êrmenîyan de gotin û praktîka karbidestên Azerbaycanî û hukûmeta Tirkîyê di pirsê hebûna netewa Kurd û qetliama Êrmeniyana de heya îro bi listîkên dîplomasiyê jî tiştên ku li meydana navnetewî têt gotin re guhê xwe digre. Karbidestên Azerbaycanê jî asimilasyona Kurdan li lêkolîn û îddiyên derew dixwazin asimilasyonêk dilxwazî(tebîî) nîşan bidin. Ji aliyê din jî ji bo daxwazên Êrmeniyên li Nagorno Qerbaxê xwe kerr dikin. Ev siyaseta han bi hevûdû re girêdayî ne û koka wan dîrokî ye.

Ez dixwazim li vir nêrînen TKP (Partiya Komunîst a Tirkîyê) jî bînim bîra xwendevanan. E ku ji Kemalîstan zêdetir dijî serhildana gelê Kurd derdiketin û di Enternasyonalîsîyemîn de li dijî serhildana 1925'an propaganda kirin TKP'yî bi xwe bûn. Helbet tiştekî pirr balkeş e ku dixwaze bi zanebûn be yan jî ne bi zanebûn be di pirsê Kurdan de Partiya Komunîst a Azerbaycanê, TKP û hukûmeta Tirkîyê di nuqtêkî de gihîştine hevûdû.

Piştî 70 sal, bi saya glasnostê, rewşenbîr "ronakbîrên Kurden li Komarên cuda cuda dest bi rexne û daxwazên xwe kirin, mîting û civînan li dar xistin, rewşa gelê Kurd bi awakî fireh pêşkêşî Moskovayê kirin. Hêvî ew e ku ji nûha û pê de rewşenbîr, xwendevan, karkir û gundiyan Kurd ên li komarên cuda cuda bi awakî tekûz dest bavêjin pirsê xwe, lêkolînen xwe bi pêşde bibin û rastîyên dîrokî derxînin holê. Ji bo vê yekê glasnost fersendek baş dide wan. Rê û hêviyên ku Perestroyka bi xwe re anîne, divê jî her alî ve bê cîhkirin.

Fîşa abonetiya Armancê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekê
120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgîroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişînin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden